



**Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtûya Zimanên Zindî Yê Li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî
Teza Lîsansa Bilind**

DAÇEK DI ZARAVAYÊ KURMANCÎ DA

BAHATTİN TAMAN

01252552

**Şêwirmend
Doç. Dr. Alk. MUSTAFA ASLAN**

Mêrdîn

2018

**Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtûya Zimanên Zindî Yê Li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî**

Teza Lîsansa Bilind

DAÇEK DI ZARAVAYÊ KURMANCÎ DA

**BAHATTÎN TAMAN
01252552**

**Şêwirmend
Doç Dr. Alk. MUSTAFA ASLAN**

**Mêrdîn
2018**

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Daçek Di Kurmancî Da” adlı tezin/projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

☐ Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

☐ Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

☐ Tezimin/Projemin 3 yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

.../.../...

Bahattin TAMAN

KABUL VE ONAY

Bahattin TAMAN tarafından hazırlanan “Daçek di Zaravayê Kurmancî da” adındaki çalışma 25/06/2018 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Bilim Dalında YÜKSEK LİSANS TEZİ olarak oybirliği ile kabul edilmiştir.

Doç. Dr. Abdurrahman Adak
A. S. M.

[İ m z a]

[Unvanı, Adı ve Soyadı] (Başkan)

Doç. Dr. Hayreddin KIZIL

[İ m z a]

[Unvanı, Adı ve Soyadı] (Üye)

[İ m z a]

[Unvanı, Adı ve Soyadı] (Üye)

Dr. Öğr. Üyesi Mustafa ASLAN

PÊŞGOTIN

Ev tez, di zaravayê Kurmancî da li ser mijara daçekan disekine û li ser pênc beşan hatîye biparvekirin. Di beşa destpêkê da, agahîyên giştî yên li ser tezê hatine dayîn. Mijar, armanc, çarçove, rêbaz û pirsgirêkên tezê hatine diyarkirin.

Di beşa yekê da, li gorî cihê daçekan li ser pêşdaçek, paşdaçek û bazindaçekan hatîye sekinandin. Herweha di vê beşê da mijara sazûna daçekan jî hatîye qalkirin û di vê çarçoveyê da, mijara daçekên xwerû, daçekên navî û daçekên hevdudanî jî hatîye dayîn.

Di beşa diduyan da bi giştî li ser wateyên daçekan hatîye sekinandin. Daçekên sereke bi awayekî alfabetîk yek bi yek hatine qalkirin û ji edebîyata klasîk û folklorê Kurdan nimûne hatine dayîn.

Beşa sisêyan, di vegotina mijarên rêzimanî da mijareka nû ye ku girîngî û têkilîya daçekan a bi beşên din ra li ber çavan radixe. Di vê beşê da têkilîya daçek û navdêr, cînavk, lêker, hoker, rengdêr, hoker û gihanekan hatîye qalkirin. Bi vî awayî mirov tê digihêje bê daçek çawa bi hemû beşên rêzimanê ra eleqedar in û tesîrê li ser wan çêdikin.

Beşa çaran jî yek ji mijarên nû ye ku heta niha di nav mijarên rêzimanî da qala wê nehatîye kirin. Ji aliyê danganîyê da mijara daçekan hatîye veçirandin. Daçek, li gorî kurtbûn, guherîn, ketina deng û parçeyên xwe û li gorî rewşa xwe ya tewangê hatîye veçirandin. Di vê beşê da mijara awayên dengên daçekan ku yek ji mijara girîng a rêzimanê ye hatîye veçirandin. Ev mijar, hîn jî aktuel e û gelek nîqaş li ser wê hatine kirin û tê kirin. Di vê çarçoveyê da sûd ji nîqaşên heyî hatîye girtin. Ronîkirina awayên dengê daçekan dê tesîrê li ser bikaranîna paşdaçekan jî bike.

Ez ji şewirmendê xwe Mustafa Arslan ra, ku xwe da ber berpirsîya vî karî, ji Zulkuf Ergun ra, ku gelek caran ez pê şewirîm û ji Eşref Keydanî ra, ku tez xwend û nirxand, ez ji wan tevan ra dibêjim mala we ava.

Bahattin TAMAN
Mêrdîn, 2018

KURTE
DAÇEK DI ZARAVAYÊ KURMANCÎYÊ DA
Bahattin TAMAN

Daçek, di Kurmancî da hêmanên herî kartêker in. Li gorî cihê xwe, pêşdaçek, paşdaçek û bazinedaçek in û carna tîn pêşîya peyvê carna jî peyvê digirin nav xwe. Li gorî sazûna xwe, bi sê awayan in: xwerû, navî, hevduyanî. Di nava hevokê da bi peyvên ra tîn bikaranîn û mayîn, berpêbûn, derketin, pêrabûn, tîdabûn, şibandin, pîvanê dîyar dikin. Herweha jî ber ku jî parçeyan pêk tîn û zêde tîn bikaranîn, bi dengên xwe tesîrê li ser ahenga zimanî jî çêdikin. Tesîra wan li ser navdêr, rengdêr, cînavk, lêker, hoker û gihanekan heye. Daçek hêmanên kurt in û pir tîn bikaranîn di wan da gelek guhertin çêdibin. Hinek jî wan kurt dibin, hinek jê tîn guhertin û hinek hêmanên wan di zimanê devkî da tîn avêtin. Awayên dengê daçekan yek jî mijareka muhîm e ku di Kurmancî da tesîrê li ser aheng û rewaniya zimanî dike û hîn jî nîqaşin li ser hene.

Di vê xebatê da, daçek jî alîyê “cîh”, “sazbûn”, “wate”, “peywîr” û “dengani”yê ve hatine veçirandin. Mebest ew e ku em bikarin daçekan li gorî cîh û sazûnê tesnîf bikin, îmkaniên wateyî yên nav hevokê raxin ber çavan, tîkilîyên daçekan û hêmanên din ên rêzimanî berbiçav bikin, rola wan a di çêkirina navdêr û lêkeran da dîyar bikin, jî alîyê denganiyê ve guhertin û veguhertinên daçekan tesbît bikin.

Bêguman lêhûrbûna daçekan, dê rê li ber gelek îmkaniên zaravayê Kurmancî veke. Ji lew ra daçek, di gelek beşên rêzimanî da hêmanên berbiçav û kartêker in. Lazim e em îmkan û derfetên daçekan dîyar bikin. Herweha xebata denganiyê ya daçekan û pîrsgirêka awayên dengî ên daçekan dê tesîrê li ser tercîha bikaranîna daçekan jî çêbike.

Peyvên Sereke: Daçek, Cihê Daçekan, Sazbûna Daçekan, Wateyên Daçekan, Peywirên Daçekan, Denganiya Daçekan

ÖZET
KURMANCİ LEHÇESİNDE EDATLAR
Bahattin TAMAN

Edatlar, Kurmanci lehçesinde en etkili dilbilgisi öğelerindendir. Pozisyon olarak kelimelerden önce kullanılır ve ayrıca çift edatlar kelimeyi içlerine alırlar. Yapı olarak yalın, ad ve birleşik durumda karşımıza çıkarlar. Cümle içinde kelimelerle kullanılarak, cümleye kalma, yönelme, çıkma, beraberlik, içinde olma, benzetme, ölçme ve soru anlamı verirler. Bunun yanı sıra parçalardan oluştukları ve fazla kullanıldıkları için dil ahengi üzerinde geniş bir etkiye sahiptirler. İsim, zamir, fiil, zarf, bağlaç gibi kelime türlerini etkilerler. Edatlar küçük parçacıklardan oluşmuşlardır ve çok kullanıldıkları için ses değişimlerine uğrarlar. Bazılarında düşme, bazılarında değişme meydana gelir. Kurmanci lehçesinde en büyük sorunlardan bir tanesi art-edatlardaki ses sorunu tercihidir ki dildeki ahenge ve akıcılığa etki etmektedirler.

Bu çalışmada, edatlar “yer”, “yapı”, “anlam”, “görev” ve “sesbilim” açısından incelenecektir. Amaç, edatları pozisyon ve yapılarına göre genel anlamda tasnif etmek, edatların cümleye kattıkları anlam imkânlarını ortaya çıkarmak, edatların diğer dilbilgisi öğeleriyle olan ilişkilerini belirtmek, edatlardaki ses değişimlerini ve ortaya çıkan problemleri analiz edip bu bağlamda bir yön belirlemektir.

Şüphesiz edatların ayrıntılarıyla incelenmesi, Kurmanci lehçesinin kullanım imkânlarını genişletecek. Çünkü birçok dilbilgisi konusuyla ilintili olan edatlar etki sahibidirler. Bu yüzden edatların kullanım olanaklarını belirtmek gerekiyor. Bu çalışma aynı zamanda, edatların ses bilimsel yönlerine eğilerek edatların kullanımın tercihleri üzerinde etki edecektir.

Anahtar Kelimeler: Edat, Edatların Yeri, Edatların Yapısı, Edatların Anlamı, Edatların Görevi, Edatların Sesbilgisi

ABSTRACT
ADPOSITIONS IN KURMANJÎ DIALECT
Bahattin TAMAN

Adpositions are the most effective grammatical elements in the Kurmanjî dialect of Kurdish. They are used before words (in the form of prepositions) and before and after words (in the form of circumpositions). They appear as simple noun and compound case as structure. Used with words in a sentence, it gives the meaning of locative, dative, ablative, commutative, inclusion, comparison, quantity and interrogative. In addition they have a wide influence on the harmony of the language, as they are formed from segments and used extensively. They affect words types such as names, pronouns, verbs, adverbs, conjunctions. Adpositions are made up of small segments and are subject to sound changes as they are used extensively. Some have elision and some have apophony, while some become shorter and some others change thoroughly. One of the biggest problems in the Kurmanjî dialect is the preference of the sounds in the adpositions, which affects the harmony of the language.

In this study, adpositions will be examined in terms of “position”, “structure”, “meaning”, “task” and “phonology”. The aim of this work is to classify the adpositions correctly in the general sense according to the positions and structures; to reveal the meanings of the adpositions which contribute to the sentences; to indicate the relation between the adpositions and the other grammatical elements; to analyse the sound changes in the adpositions and the emerging problems; and to provide a general overview of the grammar in this context.

Undoubtedly, the examination of the prepositions in detail will expand the possibilities of the usage of Kurmanjî dialect, because repositions are related to many linguistic issues and they have a big influence on the language structure. Therefore, it is necessary to specify the possibilities of the usage of adpositions. At the same time, this study will have an impact on the preferences of the usage of adpositions by focusing on the phonological aspects of adpositions.

Key Words: Adpositions, Prepositions, Circumpositions, Position of the Prepositions, Structure of the Prepositions, Meaning of the Prepositions, Tasks of Prepositions, Phonetics of Prepositions

NAVEROK

PÊŞGOTIN	I
KURTE	II
ÖZET	III
ABSTRACT	IV
NAVEROK	VI
KURTEPEYV	X
DESTPÊK	1
MIJAR, ARMANC, RÊBAZ	3
MIJARA LÊKOLÎNÊ	3
ARMANC Û GIRÎNGÎYA LÊKOLÎNÊ	4
SÎNOR Û ÇARÇOVEYA LÊKOLÎNÊ	4
RÊBAZÊN LÊKOLÎNÊ	6
PISGIRÊKÊN LÊKOLÎNÊ	7
BEŞA YEKÊ	8
DAÇEK, CIH Û SAZBÛNA DAÇEKAN	8
1.1.DAÇEK	8
1.2. CIHÊ DAÇEKAN	9
1.2.1.Pêşdaçek	9
1.2.2.Paşdaçek	10
1.2.3.Bazinedaçek	11
1.3.SAZBÛNA DAÇEKAN	12
1.3.1.Daçekên Xwerû	13
1.3.2.Daçekên Navî	14
1.3.3.Daçekên Hevdudanî	15
BEŞA DIDUYAN	17
WATEYÊN DAÇEKAN	17
2.1.Bi	17

2.1.1. Wateya Amûr Alavan.....	17
2.1.2. Wateya Şexsîbûnê	18
2.1.3. Wateya Awayê	19
2.1.4. Wateya Pardarî û Pîleyê	19
2.1.5. Wateya Sûndxwarinê.....	19
2.1.6. Wateya Demê	20
2.1.7. Wateya Hêl û Alîyan	20
2.1.8. Wateya Xwedîtîyê	21
2.2. Bê/bêyî	22
2.3. Bi... da/de	22
2.4. Bi... ra/re.....	24
2.5. Bi... ve/va	25
2.6. Di.....	26
2.7. Di... da/de.....	27
2.8. Di... ra/re	28
2.9. Ji.....	29
2.10. Ji... da/de	30
2.11. Ji... ra/re.....	31
2.12. Ji... ve/va	32
2.13. Li	33
2.13.1. Lêbûn	33
2.13.2. Berpêbûn.....	34
2.14. Bal	35
2.15. Ber.....	36
2.16. Bin.....	37
2.17. Bi qasî	38
2.18. Bo	38
2.19. Digel.....	39
2.20. Dû, pey	40

2.21.Heta	41
2.22.Nav	42
2.23.Paş	43
2.24.Pêş	44
2.25.Pişt.....	45
2.26.Pêşber, hember	46
2.27.Ser	46
2.28.Wekî, fena, nola, mîna	48
BEŞA SISÊYAN	49
PEYWIRÊN DAÇEKAN	49
3.1.Navdêr û Daçek	49
3.1.1.Peyvên ku bi alîkarîya pêşdaçekan hatine çêkirin	50
3.1.2.Peyvên ku bi alîkarîya daçekên navî hatine çêkirin.....	51
3.2.Cînavk û Daçek	51
3.2.1.Bi Cînavkên Kesîn.....	52
3.2.2.Bi Cînavkên Berbihevîn	53
3.3. Lêker û Daçek	54
3.3.1.Lêkerên ku bi alîkarîya pêşdaçekan hatine çêkirin.....	54
3.3.2.Lêkerên ku bi alîkarîya bazinedaçekan hatine çêkirin.....	55
3.3.3.Lêkerên ku bi alîkarîya daçekên hevdudanî hatine çêkirin	56
3.4.Rengdêr û Daçek	57
3.5.Hoker û Daçek	58
3.6.Gihanek û Daçek	58
BEŞA ÇARAN.....	60
DENGANÎYA DAÇEKAN.....	60
4.1.Kurtbûna Daçekan	60
4.2.Guherîna Dengê Daçekan.....	62

4.3.Ketina Tîp û Hêmanên Daçekan	63
4.3.1.Ketina Tîpên Daçekan	63
4.3.2.Ketina Pêşdaçekan	64
4.3.3.Ketina Paşdaçekan	64
4.4. Tewang û Daçek	65
4.5.Awayên Dengên Daçekan	66
 ENCAM.....	71
ÇAVKANÎ.....	73
ÇAVKANÎYÊN DÎJÎTAL	75

KURTEPEYV

amd.	amadekar
alk.	alîkar
hb.	heman berhem
hjm.	hejmar
hwd.	her wekî din
r.	rûpel
wer.	werger

DESTPÊK

Di Kurdî da, xebatên li ser zimannasîyê xwe digihînin sedsala 19an. Gelek kesên bîyanî, meraqa wan li ser Kurdî çêbûye û li gorî derfetên xwe, pirtûkên bi ziman û rêzimanê ra eleqedar hazir kirine û bêhtir berê xwe dane rêzimana Kurmancî. Xebatên li ser ziman û rêzimanê di sedsala 20î da zêde bûne, xusûsî derfetên kurdolojîya Lenîngradê rê li ber gelek xebatan vekirîye. Qanatê Kurdo, yek ji wan kesan e ku li ser zaravayê Kurmancî xebateka rêzimanî kirîye. Di wê serdemê da, di nav kurdên Kafkasyayê da, li ser rêzimanê gelek xebat hatine kirin, xusûsî li Lenîngradê xebatine hêja dihatin kirin lê mixabin danûstendineka baş di navbera kurdên Kafkasyayê û kurdên Bakurî da çenebûye ku bikarin bi rehet bidin û bistînin û sûd ji tecrûbeyên xwe bigirin.

Di wê serdemê da, ji xebatên heyî, xebata Celadet Alî Bedir Xan û Roger Lescotî bûye bingeha gelek xebatên roja me û hîn jî gelek xebat li ser wê şopê tên kirin. Rêzik û qaîdeyên rêzimana Bedir Xan û Lescotî, di Hawar û Ronahî û Roja Nû da hatine ceribandîn û îmkana pratîkê bi destê wan ketîye, bere bere xebata xwe berbihev anîne û kirine pirtûk. Bedir Xan, li ser gelek warên ziman û rêzimanê disekine û hîn wê demê balê dikişîne ser xebatên taybet ên li ser mijarên rêzimana Kurmancî. Xebatên Bedir Xan û Lescotî di warê rêzimanê da, li gorî serdema xwe gelek berfireh bûne, lê li gorî roja me di hin mijaran da em nikarin ji wan zêde sûd wergirin. Bedir Xan, Lescot û Qanatê Kurdo ew kes in ku di pirtûkên xwe yên rêzimanê da cihekî berfireh ji daçekan ra veqetandine. Bedir Xan û Lescotî, pirtûka xwe ya rêzimanê bi zimanê fransîzî amade kirine û li ser wateyên daçekan berfirehtir rawestîyane. Bedir Xan û Lescot, di pirtûka xwe ya rêzimanê da ji bo daçekan 14 rûpelan vediqetînin. Qanatê Kurdo jî ji xeynî wateyên daçekan cihekî berfireh li ser sazûna daçekan jî veqetandîye. Ji xeynî van her du rêzimanan, pirtûkên din ên rêzimanê pir bi berfirehî li ser daçekan nesekinîne.

Wextê em bala xwe didin xebatên dîtir ên li ser rêzimanê, gelek kesên ku pirtûkên rêzimanê amade kirine, pir kêmtir be jî qala daçekan kirine lê xusûsî di zaravayê Kurmancî da li ser daçekan xebateka taybet nehatîye kirin. Qanatê Kurdo di pirtûka xwe ya bi navê “Rêzimana Kurdî” da, Kurmancî û Soranî dide ber hev û li

ser daçekan weha dibêje: “Di nava hemû xebatên rêzimanê de ku li ser zimanê Kurdî hatine nivîsîn, ji alîyê darijtin û rayeka wan ve behsa daçekên ciya ciya hatine kirin. Lê di nava van xebatan de xebateke serbixwe ya ku li ser daçekan hatiye kirin nîne.” (Kurdo, 2013: 255). Di gotara xwe ya derbarê daçekan da Husein Muhammed gazineka weha dike: “Daçek, di kurdî de yek ji birrên bingeîn yê peyvan in (li gel navdêr, lêker, rengdêr, hoker û cînavan). Loma di piraniya kitêbên rêzimanê de cih ji daçekan re jî hatiye dan. Lê dîsa jî cihê ku di rêzimannameyên kurdî de ji daçekan re tê dan, beramberî cihê ku ji birrên din yê peyvan re (xaseten ji lêker û navdêran re) tê terxankirin, pir kurt û kêmtir e.” (Muhemmed, 2016:4).

Di nav beşên rêzimana Kurmancî da, beşa ku herî pir bi beşên din ên rêzimanê ra têkildar e û li ser wê kêmtir xebat hatine kirin beşa daçekan e. Daçek, yek ji mijara girîng a rêzimana Kurmancî ye. Peyva daçekê cara ewil Bedir Xanî, di Hawarê da bi kar anîye û cara ewil di rêzimana Bedir Xan û Lescotî da cihê berfireh ji daçekan ra hatiye veqetandin. Ji xeynî vê di Kurmancîya Behdînî da, ji bo navê daçekê “nîşan”, “bernav” û “amraz” jî hatiye bikaranîn.

Peywendîya daçekan bi peyvên nava hevokê ra heye û daçek ji gelek alîyan ve wateyên dîtir li wan bar dikan. Herweha di mijara cînavk, rengdêr, hoker, gihanek, navdêr û lêkeran da jî daçek hemanên kartêker in. Loma jî divê em li mijara daçekan hûr bibin û wate û peywendîya daçekan a bi hemanên din ên rêzimanê ra ji hevdu veqirînin, tesnîf û berçav bikin.

Di sazkirina hevokan da, hêmana ku herî pir tê bikaranîn daçek in, daçek ji awayê alîyan ve berê bûyerê dîyar dikan, herweha wateyên “mayîn”, “berpêbûn”, “jêderketin”, “jêçêbûn”, “pêrabûn”, û “lêbûn”ê didin peyvan. Daçek, wateya şibandin, pîvan û mêjerê li peyv û hevokan bar dikan. Di Kurdî da, gelek caran awayên daçekan ên kurt derdikevin meydana, herweha ji bo rewaniyê gelek caran tîp û hemanên wan dikevin. Ji ber ku daçek pir in û dengê wan ê paşdaçekî tesîrê li ser ahenga hevokê çêdike, tercîha bikaranîna dengê daçekan jî mijareka girîng e ji bo me. Ji ber van sedeman me daçek kirin mijara teza xwe. Di rûpelên jêrîn da em ê bi berfirehî li ser mijara daçekan rawestînin û xalên bingeîn nîqaş bikin.

MIJAR, ARMANC, RÊBAZ

Di vê beşê da, bi giştî qala lêkolînê, mebest û girîngîya wê, qala sînor û çarçove tezê û rê û rêbaza ku tez pê hatîye nivîsîn, hatîye kirin. Herweha qala pirsgirêkên vê xebatê jî hatîye kirin.

MIJARA LÊKOLÎNÊ

Di vê xebatê da, daçek ji alîyê cih, sazûna, wate, peywir û danganîyê ve hatine biparvekirin.

Yek ji mijarên girîng a vê tezê cih û sazûna daçekên Kurmancî ye ku di gelek pirtûkan da ev mijar bi awayên cur bi cur û tevlihev hatîye dayîn. Mijara wateyên daçekan jî yek mijarên sereke ê vê xebatê ye û me li gorî sazûna daçekan û bi awayekî alfabetîk û berfireh qala daçekên sereke kirine. Peywira daçekan, yek ji mijarên girîng e ku di nav beşên din da, bi awayê kurt qala wê hatîye kirin ku em ê bi berfirehî qala wê bikin û xalên wê nîqaş bikin. Danganîya dengê daçekan ku tesîra wê li ser gelek awayên bikaranîna peyvan heye, mijareka girîng a rêzimana Kurmancî ye. Pirs awayên dengê daçekan jî mijareka aktuel e ku gelek kes pê mijûl dibin û bi danganîya daçekan ra eleqedar e ku em dê bi berfirehî li ser wê mijarê jî rawestin. Li ser vê mijarê, me fikrên nivîskaran dane berhev û gelek palpişt dîyar kirine û li gorî vê yekê em gihiştine qenaetekê.

Wekî ku li jor jî amaje pê hat kirin, mijara daçekan, mijareka girîng a rêzimanê ye ku bi hemû beşên din ên rêzimanê ra têkildar e.

ARMANCI Û GIRÎNGÎYA LÊKOLÎNÊ

Armanca vê xebatê li gorî xebatên rêzimanên Kurmancî, ji alîyê cih, sazûn, wate, peywîr û denganiyê ve vekolandin mîjara daçekan e. Bi vê vekolînê mebest ew e ku em aloziya senifandina daçekan a ji alîyê sazûnê ve dîyar bikin, ji lew ra ji xebatên heyî dîyar dibû ku di vê mijarê da nelihevîyek heye. Destnîşankirina rola daçekan a bi beşên din ên rêzimanê ra jî yek ji armanca vê xebatê ye ku daçek tesîra wan li ser gelek beşên rêzimanê heye. Dîyarkirina wateyên daçekan ên cur bi cur a bi çavkanîyên edebîyata klasîk û folklorê jî dîsa armanca vê xebatê ye. Dîsa denganiya daçekan yek ji mîjara girîng e ku heta niha qala wê nehatîye kirin. Pirsgrêka awayê dengê daçekan yek ji mîjara aloz a warê denganiya daçekan e ku heta niha gelek nîqaş li ser wê hatine kirin û tên kirin. Armanca vê xebatê ew e ku di vî warî da bi palpiştan û ji nîqaşên heyî sûd werbigire û rêyekê dîyar û pêşniyaz bike.

Ev xebat bi giştî, ji gelek alîyan ve dixwaze mîjara daçekan ji hev du veçirîne û girîngiya mîjara daçekan derxe meydanê.

SÎNOR Û ÇARÇOVEYA LÊKOLÎNÊ

Qada vê xebatê, li gorî çarçoveya berhemên rêzimanî yên Kurmancî hatîye dîyarkirin. Ev xebat, bi piranî li ser pirtûkên rêzimana Kurmancî ên çapkirî hatîye kirin. Ji ber ku çarçoveya vê xebatê bi zaravayê Kurmancî hatîye sînorkirin ji zaravayên din agahî û mînak nehatine dayîn. Di warê rêzimana Kurmancî da ji pirtûkên A. Balî, Bahoz Baran, Sadiq Bahaeddînê Amêdî, Kemal Badilli, Celadet Alî Bedir-Xan û Roger Lescot, Selîm Biçûk, Qanatê Kurdo, Samî Tan, Kadri Yildirim Îbrahîm Remezan Zaxoyî, Şwanî Refî sûd hatine wergirtin. Herweha li ser mijarên rêzimanê ji pirtûk û xebatên M. Emîn Bozarslan Deham Ebdulfettah, Reşo Zîlan, Salih Akin sûd hatine wergirtin. Dîsa di warê çavkanîyên dijîtal da, ji gotarên Bahoz Baran, Perwîz Cîhanî, H. Muhammed, Mistefa Reşîd, Rojan Hazim sûd hatîye wergirtin. Di çavkanîyên zimanê Tirkî da jî Dogan Aksan û Necmettin Hacıeminoglu

û ji gotara Muhip Guneş Ozyurt sûd hatîye wergirtin. Di çavkanîyên bîyanî da ji Dennis Kurzon, Silvia Adler, Clause Hagège, Heine B., û Kuteva T. sûd hatine wergirtin. Ji bo nimuneyên edebîyata klasîk a Kurdî jî ji Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Feqîyê Teyran, Melayê Bateyî nimûneyên wateyên daçekan hatine dayîn. Di warê folklorê kurdan ji berhemên Celîlê Celîl, Mela Mehmûdê Dêrşewî, Hecîyê Cindî, Emînê Evdal û Ayhan Meretowar, bûne çavkanî. Bi giştî di warê Kurmancî da ji 13 pirtûkên rêzimanê ji 5 pirtûkên li ser mijarên ziman û rêzimanê, ji 6 gotarên li ser daçekan, ji 6 pirtûkên edebîyata klasîk û ji 5 pirtûkên folklorê kurdan û ji zimanê Tirkî 2 ji zimanê Îngilîzî jî ji 3 pirtûkan sûd hatîye wergirtin.

Li ser meseleya awayên dengê daçekan jî ji gotar û nivîsarên ku li ser înternetê hatine weşandin, ji nîqaşên ku hatine kirin û ji berhemên ku li ser pirsgerêkên rêzimanê hatine nivîsîn sûd hatine wergirtin. Ji alîyê cihê xwe ve, cureyên daçekên Kurmancî ji hev hatine veqetandin. Di vê babetê da xebatên heyî bûne bingeha vê dabeşkirinê. Pirtûka Qanatê Kurdo ya berawirdkirî ji bo Kurmancî û Soranî, di mijara dabeşkirina daçekan da, xebata herî berfireh bû ku me jê sûd wergirt. Herweha pirtûka Bedir Xan û Lescotî jî ji alîyê wateyî ve bi awayekî berfireh qala daçekan kirîye ku me ji bo vê xebatê gelek sûd jê wergirtîye. Di warê nivîsarê da, belgeyên li ber çavan ên sereke, bi edebîyata klasîk ra eleqedar in û herweha gelek xebatên di warê folklorê da jî nimûneyên nivîsara Kurmancî ne. Ji ber vê egerê di mînakên da me bêhtir berê xwe daye klasîkan û berhemên folklorîk.

Di mijara sazûna daçekan da, me ji xebatên heyî sûd wergirtin û daçek bi giştî kirin sê beş: daçekên xwerû ku daçekên eslî ne; daçekên navî ku ji navdêran hatine çêkirin û merhaleya wan a daçekbûnê didome; daçekên hevdudanî jî ku ji du daçekan pêk tên û dibin qalib. Herweha carna ji diduyan zêdetir daçek bi hev ra tên bikaranîn û komikên daçekan jî tên çêkirin. Beşa wateya daçekan jî li gorî daçekên sereke û beşa berî xwe, bi awayekî alfabetîk hatîye dayîn, di vê beşê da tevî pênaseyan ji edebîyata klasîk û folklorê mînakên cureyên daçekan jî hatine dayîn.

Di mijara peywira daçekan da me ji nav pirtûkên rêzimanê, beşên têkildarî daçekan ên rêzimanê ji hev veçirandin û bi ser hev da anîn. Di vê beşa hanê da, têkilîya daçekan a bi cînavk, rengdêr, lêker, gihanek, hoker û peyv sazîyê ra hat berçavkirin.

Di mijara danganîyê da, daçek li gorî kurtbûn, guherîn û ketinê hatin

tesnîfkirin. Me di vê mijarê da sûd ji pirtûka Bedir Xan û Lescotî girt ku gelek hûrgilîyên dengzanîyê di xebata wan da wekî nîşe hatibûn dayîn. Di vê mijarê da, ji gotarên heyî jî sûd hat wergirtin. Tewang jî yek ji mijara muhîm e ku daçek tesîrê li ser wê çêdikin. Di mijara denganiya daçekan da, yek ji mijara herî girîng awayên dengê daçekan e ku tesîrê li ser aheng û newaya peyvê çêdike. Di vê mijarê da jî me li gorî nîqaşên ku hatine kirin, danberhevîyek çêkir û her du awayên dengên daçekan jî bi cih kirin. Di vê babetê da, xebata me ji pirsên wekî, “Kî ji wan rast e?”, “Kîjan şaş e?” dûr disekine.

Ji ber ku di warê Kurdî da standardîzasyonê tune ye, bivê nevê mirov di vegotina hinek mijaran da li ser awayê tercîha daçekan da asê dimîne. Mijara dengê paşdaçekan yek ji wan qadan e. Di vê xebatê da, di nivîsîna paşdaçekan da awayê “da”, “ra” û “ve”yê hatîye tercîhkirin. Ev mijar, mijareka aktuel e ku hîn jî nîqaş li serê didomin. Guhertina dengê paşdaçekan û bikaranîna wan a di warê nivîsê da bi gelemperî bi Bedir Xanî dest pê kirîye û peyderpey heta roja me hatîye. Di klasîkên Kurdî da, di folklorê Kurdî da, di zaravayên Kurdî da û di nava gelî da bi piranî “da” û “ra” tên tercîhkirin û guhertina daçekan ji bo gelek însanan zehmet e. Dengê “a”yê dengdêreka dirêj e û gelek caran xwe diparêze û nakeve û frekansa wê bilind e, lê dengê “e”yê jî ji ber ku dengdêreka kurt e, gelek caran dikeve û frekansa wê nizm e. Paşdaçeka “ve”yê, di klasîkan da, di folklorê da û di nav miletî da belav bûye û xwedî palpişt e. Jixwe mesele wextê bibe meseleya standardîzasyonê, tradîsyon, bikaranîna piranîyê, yekîtiya zaravayan û formê kevin gelek caran dibin bingeh. Loma jî di çarçoveya vê xebatê da daçekên “da” û “ra”yê hatin tercîhkirin.

RÊBAZÊN LÊKOLÎNÊ

Xebatên zanistî, lazim e, xwe li rê û rêbazên zanistî bigirin. Ev rê û rêbaz li gorî cureyê xebatê diguherin. Ev xebat, li gorî fikrên giştî ber bi darazan ji darazan ber bi mînakên hatîye amadekirin. Pêşî mijar hatine pênasekirin, piştî pênasekirina mijaran ji bo xurtkirina darazê ray û ramanên dîtir lê hatine zêdekirin. Bi mînakên ev yek hatîye xurtkirin.

Ji bo xurtkirina mijaran, ji pirtûkên têkildar ên rêzimanên Kurmancî agahî hatine girtin. Herweha carna mînakên wan pirtûkan jî lê hatine zêdekirin. Ji pirtûk,

gotar, rojname û ji ser înternetê agahî hatine neqilkirin. Di beşê wateya daçekan da, ji edebîyat û folklorê kurdan nimûne hatine dayîn.

PIRSGIRÊKÊN LÊKOLÎNÊ

Di pêvajoya nivîsîna vê xebatê da, pirsgirêka ewil, pirsgirêka çavkanîyên mijara daçekan bû. Ji xeynî yek didu berheman, gelek pir bi kurtasî qala vê mijara hanê kiribû, herweha li ser zaravayê Kurmancî ji alîyê daçekan ve xebateka berfireh nehatibû kirin. Yek jê jî pirsgirêka cih û sazûna daçekan bû. Çimkî her xebata ku me lê dinîhêrî bi awayekî din daçek saz kiribûn, me jî li gorî xalên hevpar ên wan xebatan, daçek saz kirin. Daçek, di wan pirtûkan da jî bi yek du hevokan û bi hinek mînakên hatibû qalkirin.

Di hinek pirtûkan da, pir eşkera bû ku sazûna hinek daçekan şaş bû û daçek di hinek cihan da tevlihev bûbûn. Heta ji me hat, me xwe ji wan tevlihevîyan dûr xist. Li ser mijara daçekan, bîblîyografiyek jî nîn bû ku ji mirovî ra bibûya rêber. Em dikarin van tiştan ji bo vê xebata lêkolînî wekî pirsgirêk bihesibînin.

Heger em qala kêmanîyên vê xebatê bi xwe bikin, yek ji kêmanîya vê xebatê ew e ku di warê mijara daçekan da ji hêla teorîyê ve herçiqas hin çavkanîyên bîyanî yên sereke bûbin papişt jî me xwe negihandîye çavkanîyên bîyanî yên dîtir. Herweha sîdwernegirtina hin pirtûkên bîyanî ên li ser rêzimana Kurmancî jî, wan jî herçiqas bi hindik qala vê mijarê kiribe jî, kêmanîyeka vê xebata hanê ye. Kêmanîyeka din jî nebûna mînakên daçekan ên hemû herêm û deverên kurmancîxêv e. Ev xebat ji ber ku li gorî rêzimanên çapkirî hatîye amadekirin, me ji bo daçekan jî çarçoveyek danî û qala gelek daçekên sereke kirin. Di vê mijarê da, hin daçekên dîtir li derveyî vê çarçoveyê man. Ev jî ji bo vê xebatê kêmanîyek e.

BEŞA YEKÊ

DAÇEK, CIH Î SAZBÛNA DAÇEKAN

1.1.DAÇEK

Daçek, ew hêmanên rêzimanî ne ku bi tena serê xwe wateya wan nîn e, lê wextê bi peyvên din ra tên bikaranîn û qaliban çêdikin wateyên nû didêrin. Hagége li ser vê yekê weha dibêje: “Daçek weku bêjeyeka rêzimanî ku analîzbar an neanalîzbar e, frazeka daçekî ava dike û mîna gireyên rewşê, pêwendîyê bi yekîneyeka din ya sentaktîk re çê dike ku ew têkilî hem girêdanên sentaktîk hem jî semantîk in.” (Hagége, hb. 2010:8) Daçek, ji awayê alîyan ve berê bûyerê dîyar dîkin, herweha wateyên “mayîn”, “berpêbûn”, “jêderketin”, “jêçêbûn”, “pêrabûn”, û “lêbûn”ê didin peyvan. Daçek, wateya şibandin, pîvan û mêjerê li peyv û hevokan bar dîkin. Tan jî li ser vî alîyê daçekan weha dibêje: “Dîsa daçek ji aliyê wateyê ve (wekhevî, dijberî, sedem, cih û bergeh) di navbera peyvan de têkiliya wateyî pêk tînin.” (Tan, 2011: 187).

Herweha di çêkirina rengdêr, cînavk, lêker û navdêran da kartêker in û herweha bi peywira hoker, gihanekan jî radibin. Bi alîkarîya daçekan, hêmanên nav hevokê bi hev ra tên têkildarkirin, loma jî em dikarin bibêjin yek ji rola sereke ya daçekan peywira wan a navgînîyê ye. Kurzon û Adler li ser vê yekê weha dibêjin: “Daçek gelek caran weku hêmanên neguher (invariable) tên pênasekirin ku berî yan jî piştî temamkera navdêr-surîştî (nominal nature) tên û wê bi hêmaneka din ya risteyê ve pêwendîdar dîkin.” (Kurzon, Adler, 2008:2) Daçek bi vê peywira xwe ya navgînîyê wateyan li hêmanên hevokê bar dike. Necmettinoglu jî li ser vê daçekan weha dibêje:

“Daçek, di Erebi da wateya navgînê dide. Wextê em di nav rêzimanê da cihê wê dîyar dîkin, divê em vê jî bîr nekin, jixwe wekî hêmaneka rêzimanî tu wateyên daçekan nîn in, ew ancax navgînên wisa ne bi têkilîya hin peyvên din wateyan didêrin. Mirov dikare bibêje ku daçek, xerca di navbera hêmanên zimanî da ne.” (Necmettinoglu, 2015: 13).

Dîyar e ku bi tena serê xwe wateyan daçekan tune ne, ew ancax wextê bi peyvên din ra tên bikaranîn dibin qalib û wateyên nû didêrin. Yek ji tiştên ku girîngiya daçekan derdixe meydana jî têkilîya wê û beşên din ên rêzimanê ye. Daçekên Kurmancî bi awayekî xurt bi beşên din ên rêzimanê ra jî têkildar in.

Mûrad Ciwan jî, di pirtûka xwe ya rêzimanê da li ser pêwendîya daçekan û beşên din ên rêzimanê weha dibêje:

“Daçek ji xeynî peywira xwe ya esil, bi navdêr, rengdêr, lêker, cînavk û hokeran ra jî tên bikaranîn û rengdêr, lêker û hokerên nû jî çêdikin.” (Ciwan, 1992: 139).

1.2. CIHÊ DAÇEKAN

Cihên daçekê, pozîsyona daçekê yê li nav hevokê ye. Di Kurmancî da daçek, di nava hevokê da, yan berî peyvê tên û pê ra qalibekê çêdikin yan jî peyvê digirin nava xwe. Daçek, wextê bi peywira hokerê rabin û bi cotepeyvyan ra bîr bikaranîn dikevin nav du peyvyan. Di nav hevokê da cihê daçekê yê dîyar tune ye, daçek carna li serê hevokê, carna li navê û carna jî li dawîyê ne. Li gorî cihê xwe, sê awayên daçekan hene. Balî, peywira wan a alîkarîyê destnîşan dike û weha behsa cihê daçekan dike:

“Daçek, tên pêşî û paşîya peyvyan û rewşên wan dîyar dîkin. Wekî peyv, bi tena serê xwe, wateyan nadêrin, lê taybetîyên wan ên rêzimanê hene. Ji ber ku bi peyvyan ra tên bikaranîn ew wekî navdêr û lêkeran hêmanên nayên qebûlkin, hew hêmanên alîkar in.” (Balî, 1992: 156).

1.2.1. Pêşdaçek

Pêşdaçek, hêmanên daçekê ên xwerû ne û tên pêşîya peyvyan, bi wan ra dibin qalib û tesîrê li wan dîkin. Ev hêman carna jî dikevin nav peyvê. Bedir Xan û Lescotî di pirtûka xwe ya bi navê rêzimana Kurmancî da bi berfirehî cih dane vê mijarê. Ji alîyê cih û peywirê ve weha qala pêşdaçekan kirine:

“Daçekên Eslî (Pêşdaçek) ev in:

Bi Pêrabûn, navgînê dide.

Bê Neyînîya daçeka “bi”yê ye.

Di Hundir, hewandinê dide.

Ji Dûrketin, jêkirin, çûnê dide.

Li Dayîn, barkirin, cihî dide.” (Bedir Xan û Lescot, 1997: 227).

Pênc pêşdaçekên xwerû hene. Ji van pêşdaçekan a ku herî pir tê bikaranîn û gelek wateyan dihevine, daçeka “bi”yê ye. Neyînîya vê daçekê “bê” zêde ne kartêker e. Daçeka “di”yê kêman bi tena serê xwe tê bikaranîn û mînakên wê zêde nîn in. “Ji” jî yek ji wan daçekan e ku zêde tê bikaranîn û wateyên cur bi cur dide. Wateya sereke ya daçeka “li”yê jî “berpêbûn” û lêbûn”ê ye.

Mînak:

Bi te ev çawa ye? (gorî)

Ew *bi* erebeyê çû bajêr. (navgîn)

Bê min nanî nexwin. (neyînî)

Bê erebe çû sûkê. (neyînî)

Ew bela bû *di* me gerîya. (têwerbûn)

Li malê çi dike ew kurik? (lêbûn)

Li erebeyê siwar bû. (berpêbûn)

1.2.2. Paşdaçek

Paşdaçek, hêmanên daçekên xwerû ne û piştî peyvên tîn bikaranîn û bi wan ra dibin qalib û tesîrê li wan dikin. Ev daçek, bi tena serê xwe nayên bikaranîn, lê wextê pêşdaçek bikeve bi tena serê xwe dimînin. Ciwan, li ser vê yekê weha dibêje: “Di rewşên pir îstîsnayî da, “de”, “re”, “ve” dibin paşdaçek û bi tena serê xwe tîn bikaranîn. Di vê rewşê da jî ji ber ku pêşdaçek ketîye, serbixwe mane. (Ciwan, 1992:140). Wekî ku Bedir Xan û Lescot jî amaje pê dikin, wateyên paşdaçekan ev in: (Bedir Xan û Lescot, 1997:227-228).

... *da* Mayîn, hewandin, tîdabûn, tevger

... *ra* Dayîn, pêrabûn, berpêbûn, tevger

... *ve* Pêrabûn, tevger, aîdîyet, zeliqîn.

Mînak:

Di vê qutîyê da çi heye? (têdabûn)
Ew jî bi rêya xwe da çûn. (tevger)
Ji wan ra qala min bike. (berpêbûn)
Aşîta mezin ji wir ve hat. (tevger)
Vîya bi dîwarî ve bike. (zeliqandin)
Ji berê ve li me wisa dikin. (tevger)

Daçeka “da”yê bêhtir mayîn û cihî nîşan dide ku carna bi awayê bê hereket tişteke an kesek li wir e, carna jî hereket û tevger ji wir dest pê dike. Herweha daçeka “ra”yê jî derbasbûn û berpêbûnê dide. Paşdaçeka “ve”yê zeliqîn û berdeyamî, tevgerê nîşan dide.

1.2.3. Bazinedaçek

Paşdaçek, bi tena serê xwe nayên bikaranîn, wextê pêşdaçekên xwerû û paşdaçekên xwerû bi hev ra tên bikaranîn, bazinedaçek derdikevin meydana. Ciwan li ser vê weha dibêje:

“Di eslê xwe da, pêşdaçek û paşdaçek ji ber ku ne serbixwe ne û peyv dikevin nav her du hêmanan, a rast divê mirov wan ji hev du veneqetîne, divê mirov wan bi hev ra wekî hêmanên daçekî hesab bike.” (Ciwan, 1992:140).

Bazinedaçekên ku ji pêşdaçek û ji paşdaçekan pêk tên, peyvê digirin nav xwe. Peyv û qaliba ku dikeve nav bazinedaçekan lazim e pir dirêj nebe û gotin ji paşdaçeka wê pir dûr nekeve. Bazinedaçek ev in:

Bi... da/de

Bi... ra/re

Bi... ve/va

Di... da/de

Di... ra/re

Ji... da/de

Ji... ra/re

Ji... ve/va

Mînak:

Rovî bi wir da çû.

Bi min ra xeber dane.

Bi golikê ve zeliqîye.

Di hundir da çi heye?

Di nav xelkê ra derbas bû.

Ji berê da ev li ser wan e.

Ji min ra qala geniman dîkir.

Ji wê ve xuya nake.

Ji mînakan jî dîyar dibe ku bazinedaçek peyvan digirin nav xwe, wan ditewînin û wateyên cur bi cur li peyvan bar dîkin.

1.3. SAZBÛNA DAÇEKAN

Peyvsazî, awayê çêkirina peyvan dîyar dike. Bi rêya vê zanistê, mirov dirûvê çêkirina peyvan, cureyên wan û rêz û rêzikên çêkirina peyvan nas dike. Daçek, li gorî sazûna xwe bi sê awayan tên dabeşkirin. Daçekên xwerû, daçekên navî û daçekên hevdudanî. Li ser dabeşkirina daçekan, Kurdo weha dibêje:

“Li ser darijtin, esil û cureyê dabeşkirina daçekan hinek caran bîr û rayên dijber ên nivîskarên rêzimana Kurdî hene û tu kes ji wan nekariye xwêner îqna bike, tenê xebata Zerê Arif Yuspoveyê ya ku li ser daçekên dîyalekta jêrîn e ji van xebatan cihê ye.” (Kurdo, 2013:255).

Kurdo piştî hinek lêkolînan gihiştîye wê qaneatê ku daçek dibin çar beş “Daçekên Xwerû”, “Daçekên Navî” û “Daçekên Çawanîyê”, “Daçekên Nexwerû.” (Kurdo, 2013:256). Lê di vê dabeşkirinê da jî hinek arîşe hene. Ji lew ra daçekên ku bi cînavkan ra tên bikaranîn êdî ji peywira daçekbûnê dûr dikevin. Kurdo ew xistine nav vî beşî. Dîsa Saqîd Baheedînê Amêdî, daçek bi awayê “Daçekên Xwerû” û “Daçekên Lêkdayî” ji hev veqetandine. (Amêdî, 2012:259). Tan, di xebata xwe ya bi navê rêzimana Kurmancî da, daçek dîsa bi heman awayî wekî daçek “Daçekên Xwerû” û “Daçekên Hevedudanî” ji hev veqetandîye. Lê tu navekî li daçekên navî

nekirîye. (Tan, hb.: 187-188). Bi çî awayî be jî bi giştî koma ewil a daçekan ku daçekên eslî tên qebûlîkirin di bin navê “Daçekên Xwerû” da hatîne senifandin. Wextê du daçek bi hev ra hatine veqetandin, di nava vê tesnîfê da bûne “Daçekên Hevdudanî”. Koma din a daçekan jî “Daçekên Navî” ne ku dîyar e ku ji nava hatine çêkirin. Di pirtûka Bedir Xan û Lescotî da, amaje bi vê mijarê nehatîye kirin û daçek bi tenê li gorî cihê xwe hatine senifandin, “pêşdaçek”, “paşdaçek” û “daçekên taqimî”. Daçekên xwerû, di vê xebatê navborî da bi awayê “daçekên eslî” hatine dayîn û ji aliyê sazûnê ve daçek ji hev nehatine veqetandin. (Bedir Xan û Lescot, 1997).

Li gorî xebatên li ber destan, li ser sazûna daçekan em digihîjin van qanaetan: Herçî pêşdaçek û paşdaçek û daçekên taqimî ne, ew di eslê xwe da daçekên xwerû û eslî ne, wextê du daçekên serek bi hev ra bînan bikaranîn, daçekên hevdudanî dertên meydanê, hinek daçek jî ji navdêran hatine û daçekên navî ne. Daçek wextê ji diduyan zêdetir bin û bikevin nav hev, komikên daçekan dertên meydanê.

1.3.1. Daçekên Xwerû

Daçekên xwerû, bi tena serê xwe tu wateyê nadêrin. Ev daçek, hinek jê wekî pêşdaçek bi tena serê xwe tên bikaranîn, hinek ji wan jî dibin bazinedaçek û peyv di nava her du daçekan da cih digire. Daçekên xwerû, gelek caran bi daçekên din ra jî tên bikaranîn. Tan weha dibêje: “Daçekên xwerû hinek ji hêmanekê pêk hatine û berî navdêrê tên, hinek ji wan ji du hêmanan pêk hatine; ji pêşdaçek û ji paşdaçekan, ev her du hêman bêjeyê digirin nav xwe.” (Tan, hb: 187). Daçekên xwerû ev in:

Pêşdaçek

Bi, bê, di, ji, li

Paşdaçek

Da/de, ra/re, ve/va

Bazinedaçek

*Bi...da/de, bi...ra/re, bi...ve/va, di...da/de, di...ra/re, ji...da/de, ji...ra/re,
ji...va/ve*

Mînak:

*Bi potikê birîna min pêça.
Bê min neçe sûkê.
Vê kefçiyê di şorbê meke.
Ew îro ji sûkê tê.
Li malê çi karî dike?
Bi rêya xwe da çû.
Bi min ra hatîye.
Ta bi derzîyê ve kir.
Di vê pirtûkê da, helbest hene.
Di pirê ra derbas bû.
Ji berê da ev wisa bû.
Ji wê ra qala min bike.
Ji min ve xuya nake.*

Ji mînan jî dîyar e ku pêşdaçek tenê ji yek hêmanê pêk hatine û tîna pêşîya peyvan û wateyan li wan bar dîkin. Herçiqas di zimanê devkî da pêşdaçek ketibin û paşdaçek bi tena serê we bîna bikaranîn jî di warê nivîsê da bikaranîna paşdaçekan a bi tena serê xwe rast nayê qebûlîkirin. Ew ancax bi pêşdaçekan ra tîna bikaranîn û bazinedaçekan çêdîkin. Bazinedaçek jî ji du hêmanên daçekî pêk tîna lê wekî yek daçekê tîna qebûlîkirin.

1.3.2. Daçekên Navî

Daçekên navî, di eslê xwe da navdêr in, lê wekî daçek hatine bikaranîn. Daçekên navî ji bo bi vî peywira rabin, lazim e tîna kevîna rewşa daçekan, qertafan navdêran negirin û peyva piştî xwe bitewînin. Ozyurt, di gotara xwe da ku li ser daçekên zimanê îranî nivîsîye qal dike ku çawa navdêr û bi taybetî endamên laşê mirovan yîna wek “ser”, “pişt”, “dûv” gramatîkalîze bûne û bûne daçek. (Ozyurt, 2016:83-94). Ev daçek, wextê bi daçekên xwerû ra tîna bikaranîn ji wan daçekên

hevdudanî çêdibin. Ji van daçekan hinek jê “alî” û “hêl”an nîşan didin, hinek ji wan jî wateya “pîvandî” û “şibandî”ê çêdikin. Daçekên navî, “bal, ber, bin, bo, der, dû, hember, heta, nav, paş, pêş, pişt, pêşber, ser, wekî...” ne. Li ser van daçekan Kurdo weha dibêje:

“Daçekên navî, gurubeke taybet pêk tînin, yanî ev daçek awayên xwe yên navî parastine... Ev nav hemû rola daçekan digêrin û di nava ravekê de jî tînin bikaranîn. Daçekên beşa yekem, ên mîna (li, bi, di, ji)yê (Soranî: le, be, de, je) dikevin pêşîya van daçekan.” (Kurdo, 2013:273-374).

Muhammed, jî di xebata xwe ya li ser daçekan da weha dibêje: “Hejmara daçekên bingeîn di kurdî û zimanên din yên îranî da bi sînora ew wek navdêr û bi hemû taybetmendiyên navdêran tînin bikaranîn lê carinan jî ew wek daçekan tev digerin û dixebitin.” (Muhammed, 2016:34). Daçek jî gramatîkalîzebûna hoker û lêkeran jî çêdibin lê li gor Heine & Kuteva yek ji çavkanîya bingeîn ya daçekan ku pêşdaçek û paşdaçek jê hatine, navdêr in. (Heine & Kuteva, 2007:62) Daçekên navî, ketine rewşa daçekbûnê, hinek ji wan êdî bi temamî taybetîyên daçekan li xwe bar dikin û bûne daçek, hinek ji wan taybetîyên navî didomînin. Hin jî wan daçekên navî ev in:

Bal, ber, bin, bo, der, dû, hember, heta, nav, paş, pêş, pişt, pêşber, ser, şûn, wekî...

Mînak:

Çû *cem* birayê xwe.

Da *dû* xwe û bi rê ket.

Hat *bin* dara bihokê.

Ber xwe nabîne êdî.

Heta sibehê xew neket çavan.

Wekî însanan nan nedixwar.

Ma ne em jî însan in?

1.3.3. Daçekên Hevdudanî

Daçekên hevdudanî bi du awayan tînin çêkirin. Di awayê ewil da, pêşdaçekên xwerû (bi, di, ji, li) tînin ber daçekên navî (ber, bin, bo, qas, ser, pêş, paş...) û daçekên

hevdudanî tên çêkirin. Di awayê diduyan da jî daçekên navî dikevin nava bazinedaçekan (bi...da/de, bi...ra/re, bi...va/ve, di...da/de, di...ra/re, ji...da/de, ji...ra/re, ji...va/ve)¹ û daçekên hevdudanî tên çêkirin.

Awayê Ewîl

Ew dîsa *bi ser* wî ket.
Ber bi rojhilatî çû.
Ew *bi bin* avê ket.
Dostên me *di ber* hev didin.
Xanim *ji bin* xanî derket.
Xwe *ji ber* derî bide alî.
Li bin darê çî dike?
Ez *bi qasî* te naxwînim.
Ji bo min tê vê derê.

Awayê Diduyan

Bi ser wî *da* çû.
Tu here ez ê *bi dû ra* bêm.
Xanim *bi şûn da* vegerîya.
Di nav pirtûkê *da*, şaşî hene.
Di bin ra mezelê me dikole.
Ji paş wî *ve* derket hat.

Carna ji diduyan zêdetir daçek digihîjin hev û komikên daçekan derdikevin meydanê.

Mînak:

Di pirtûka *li ser* daçekan *da*, ev mijar hebû.
Ji vir bi şûn da, em ê dengê xwe bikin.

¹ Mînakên bazinedaçekan “ji...ra”yê ya daçekan navî digire nava xwe, pir kêr in.

BEŞA DIDUYAN

WATEYÊN DAÇEKAN

Daçek, wateyên hêl û alî, jêçêbûn, jêderketin, derbasbûn, mayîn, berpêbûn, pêrabûn, armanc, sedem, rade, pîvan û şibandîna didêrin. Muhammed, di vê derbarê da weha dibêje: “Daçek (adpozisyon, bi inglîzî adposition) birreke peyvî (word class) ya rêzimanî ye ku têkiliyên cihî yan demî diyar dike yan jî hin erkên wateyî nîşan dike.” (Muhammed, 2016:2) Ev wateyên ku hatine diyarkirin, li gorî hin daçekên sereke wateyîne diyar û berçav in. Daçek gelek wateyên din jî dihewînin, di nav wateyan da, wateya demê jî heye. Di vê beşê da, daçek li gorî awayê sazûna xwe dê bi awayekî alfabetîk bên analîzkirin. Li gorî çavkanîyên li ber destan, di Kurmancî da, daçekên sereke yên ku me tesbît kirin digel wateyên xwe bi vî awayî ne:

2.1. Bi: Yek ji daçeka ku xwedî fonksîyonên zêde ye, daçeka “bi”yê ye. Di pirtûka Bedir Xan û Lescotî da, fonksîyonên wê yên “amûr”, “awa”, “wext”, “li ser”, “tê da” û “şexsîbûn”ê hatine diyarkirin, herweha ev daçek, di bikaranîna hinek lêkeran da peywira têrker û lêkerî jî hildigire ser xwe. (Bedir Xan û Lescot, hb.: 230). Di pirtûka Baranî da hin taybetîyên vê daçekê ên din jî hatine diyarkirin, ev daçek, bi cînavkên tewandî ra tê bikaranîn û wateya berpêbûnê dide û peyvî dike bireser û têrker, di sûndxwarinan da tê bikaranîn, di çêkirina lêker û navdêran da jî ev daçek kartêker e. (Baran, 2012: 107-108). Bi giştî wateyên vê daçekê ev in:

2.1.1. Wateya Amûr û Alavan

Ev daçek, wateya bikaranîna amûr û alavan dide:

Mînak:

Wî goşt, *bi* kêra xwe jê kir.

Mala xwe, *bi* destê xwe xerab kir.
Min penêr, *bi* destan jê kir.
Ew, *bi* trêne çû.

Xanî, di Mem û Zînê da ev daçek weha bi kar anîye:
“Hindek *bi* peyayî çûn baxan
Hindik *bi* siwarî çûne raxan.” (Xanî, 2005: 224).

Cizîrî, di helbesteka xwe da ev daçek weha bi kar anîye:
“Kuştim *bi* qewsê ‘enbere eşoxê ji dil mil dan ber e
Êxiste dil sed pencere evreng em mihnetkêş in.” (Cizîrî, 2012: 178).

Feqî, di helbesteka xwe da ev daçek di vê wateyê da bi kar anîye:
“Hubba te ez ker ker kirim
Bi çak û gaza muhbetê.” (Feqî, hb.: 305).

2.1.2. Wateya Şexsîbûnê

Bi cînavkên kesan ra tê bikaranîn û wateya “şexsîbûn”ê dide.

Mînak:

Bi te ev çima wisa dike?
Bi min em êdî hinekî bêhna xwe bidin.
Bi wî, em tev şaş in.
Bi we, bersiva vîya çi ye?

Cizîrî di helbesteka xwe da vê daçekê weha bi kar tîne:
“Leylet ul-Qedr e *bi* min ew se’et û ‘îd e di salê.” (Cizîrî, hb.: 282).

Dîsa Xanî di Mem û Zînê da vê daçekê weha bi kar tîne:
“Ev emr-i *bi* min qewî muhal e
Ev xewn e we dîtî, ya xiyal e.” (Xanî, hb.: 262).

2.1.3. Wateya Awayê

Di vê wateyê da, bi peywira hokeran radibe, tesîrê li ser lêkeran çêdike û wateyên “awa” û “tarz”ê dide.

Mînak:

Me zivistan, *bi* dijwarî derbas kir.

Wan, em *bi* darê zorê ji gundî derxistin.

Tu *bi* xêr û xweşî herî.

Dîsa *bi* girî hate malê.

Feqî, di helbesteka xwe da bi vî awayî vê daçekê bi kar tîne:

“Tê *bi* lez şubhetê bayê

Li feresê çeng j’hewayê.” (Feqî, hb.: 339).

Herweha Xanî jî di Mem û Zînê da vê daçekê weha bi kar tîne:

“Wan pirs dikirin ku, ger bibînin

Da bo xwe *bi* merdî dest hilînin.” (Xanî, hb: 232).

2.1.4. Wateya Pardarî û Pîleyê

Di nav cotepeyvyan da tê bikaranîn û wateya rêjeya nav tiştan a wekhev dide û ji alîyê pîleyê ve wateya tiştên ku bere bere çêdibin dide.

Mînak:

Çûk ref *bi* ref difirin.

Zarok sê *bi* sê dimeşin.

Roj *bi* roj baş dibe.

Sal *bi* sal dihele diçe.

“Bestine zulfê der kemîn helqe *bi* helqe çîn *bi* çîn

Yexma dîkin dilan nihîn têne yeqîn Xetayê zulf” (Cizîrî, hb.: 138).

2.1.5. Wateya Sûndxwarinê

Bi hinek peyvyan ra tê bikaranîn û wateya “sûndxwarinê” dide.

Mînak :

Bi telaq, ev ne wekî te ye.

Bi wê Qurana min xwendî, tu şaş î.

Bi serê te, tu eleqeya min pê tune.

Bi Xwedê, ev zalim in.

Di pirtûka xwe ya berhevkarîyê da Celîl vê daçekê weha bi kar anîye:

“De rabe ji oda min derkeve,

Dîya minê, xuha minê, jina bîyê, bi Xwedê mi te nevê” (Celîl, 2018: 86).

2.1.6. Wateya Demê

Wextê bi hêmanên demî ra tê bikaranîn, wateya demê dide û bi peywira hokeran radibe. Herweha wateya

Mînak :

Bi roj pirsî me kir.

Bi şev hat ber derîyê me.

Berî vê *bi* rojekê hat.

Feqî, di helbesteka xwe da vê daçekê weha bi kar tîne:

“Er bi şev er *bi* roj im

Ez murxê nav hezar e.” (Feqî, hb.: 155).

2.1.7. Wateya Hêl û Alîyan

Alîyê ku tevger û hereket ber bi wê ve diçe nîşan dide. Li vir gelek caran bi daçeka “ber”ê ra tê bikaranîn.

Mînak:

Ber *bi* bajêr çû.

Artêş ber *bi* Rojhilatê diçe.

Ber *bi* malê here.

Ew ber *bi* min hat.

Di pirtûka Celîl ya berhevkarîyê da ev daçek weha hatîye bikaranîn:
“Pismamo, nizamim çi sefer e ber *bi* me tê
Nizamim kê got navê Hesênê Elî Mîrxe Axa derketiya li kunya vê dewletê...”
(Celîl, hb.: 271).

2.1.8. Wateya Xwedîtîyê

Bi lêkera “bûn”ê ra tê bikaranîn û wateya “xwedîtîyê” dide.

Mînak :

Ez *bi* mal û milk im.
Tu *bi* pez û dewar bûyî.
Ez *bi* gotin bûm, te nehişt ez bixivim.
Bi dar û ber bû ev çîya.

“Ez l’êre emîn û dest *bi* dar im
Lêkî di vî milkî hîssedarim” (Xanî, 1968: 450).

Daçeka “bi”yê li gorî awayê bikaranîna peyvên gelek wateyan didêre. Li ser pîrwateyîya daçekan Bedir Xan û Lescot weha dibêjin:

“Bi xwendina vî beşî, dê bê famkirin ku komên daçekan cotwateyan di xwe da dihevin, ihtimalên pevgihana paşdaçek û pêşdaçekan, ji alîyê wateyê ve, guherbarî û pîrrengîyê çêdikin. Sebeba vê yekê, pîrbûna zarava û devokan e, herweha guherbarîya zimanî jî yek ji wan sebeban e û ev ji bo derbirînê tiştekî normal e.” (Bedir Xan û Lescot, hb.: 228).

Di vê çarçoveyê da wextê mirov bala xwe bide daçeka “bi”yê, dê bê dîtîna gelek awa û wateyên wê yê bikaranînê hene.

Mînak:

Ev erd *bi* çendan e? (rêje)
Xwezîya min *bi* dilê te. (berpêbûn)
Karê xwe *bi* wext hal bike. (dem)
Bi tenê tu were hinda min. (hew)

2.2. Bê/Bêyî: Ev daçek, awayê neyînî yê daçeka “bi”yê ye. Lê wateyên wê wekî “bi”yê ne zêde ne. Bêhtir wateya neyînî dide hevokê. Reşo Zîlan, li ser vê weha dibêje:

“Ji aliyê rêzimanî ve rola herdukan jî yek e. Lê belê, herwekî têtê zanîn, ew ji aliyê mane û naverokê ve du pirtikên bervajiyên hev in. Heçî bê ye, ew di maneya tunebûn, pêrenebûn û hwd de ye. Ew ji peyva bêyî hatiye kurt kirin û bûye bê. Car caran dibe bê jî.” (Zîlan, 1991: 70).

Mînak:

Min, zebeş *bê* kêr jê kir.

Bê min neçî wê derê.

Ew di nav wan gelîyan da *bê* tirs digerin.

Şorbeya me *bê* xwê ye.

Bê dar û ber ma welatê me.

Ez *bê* mal û milk im.

Ew *bê* dar û ber e.

Bê hesap pere belav dikir.

Zivistan *bê* dijwarî derbas bû.

Xanî, di Mem û Zînê da weha bi kar tîne vê daçekê:

Mem ji bo vî rengî *bê* xeber bû

Xwîna dilê wî bi der ve der bû” (Xanî, 2005.: 554).

2.3. Bi..... da/de: Ev daçek, wateyên “çûn û hatin”, “li ser”, û “berpêbûn”ê didin peyvan. Kurdo weha dibêje: “Dema daçeka “bi”yê (Sorani: be) dikeve pêşiya navan û digel wan li hev dikevin, di awayê rewşa cîwarî de dibin û qewimîna rûdanê bi ser tiştan yan sedema tiştan ve nîşan dide.” (Kurdo, 2013: 260). Tevgera vê daçekê cihekî dîyar nîşan dide. Tan, li ser vê daçekê weha gotiye: “Tevgera ber bi cihekî nîşan dide. Ji aliyê wateyê ve nêzî “bi... ve”yê ye, lê cudatîyek di navbera her duyan de heye. Di “bi... de” yê de tevger ber bi cihekî dîyar e.” (Tan, hb.: 192).

Mînak:

Bi rêya xwe da çûm.

Bi wî alîyî da here.

Destmal bi avê da çû.

Bi rê da ye dê saetekî din bê.

Van rojan dê bi alîyê me da bê

Aşît bi ser wî da hatîye.

Hûn jî bi pêş da herin.

Ew bi paş da hatine.

Celîl di pirtûka xwe ya berhevkarîyê da weha bi kar tîne vê daçekê:

“Va mêvan çû, ez ê bêm bê hewalê wê çi ye?

Ilîm hewalek *bi* serê vê pîrekê *da* hatîye...” (Celîl, 2018: 107).

Ev daçek, bi giştî berê çûna bûyer û qewimînan nîşan dide. Gelek caran bûyera ku qala wê hatîye kirin bi dawî bûye ji ber vê jî dem, dema borî ye.

Mînak:

Bi alîyê malê da çû.

Ew bi hêla wan da ket.

Herweha ev daçek gelek caran bi daçekên, “ber, bin, dû, nav, nîk, paş, pêş, pey, rex, rû, ser...”ê ra tê bikaranîn û daçekên hevdudanî dertên meydanê.

Mînak:

Esker ber bi wî da çûn.

Pir bi ser min da neyê.

Bi pey wî da hilkişîyan.

Xanî, di Mem û Zînê da ev daçek weha bi kar anîye:

“Dayîn û Sitî ku çûn *bi ser da*

Hindî ku ewan digel xeber *da*” (Xanî, hb.: 556).

2.4. Bi.....ra/re: Ev daçek, wateya kes an tiştê ku mirov pê ra ye didêre. Muhammed, li ser wê weha dibêje: “Dordaçeka “bi ... re” yan “bi ... ra”, bi forma xwe ya serbixwe “pê re, pê ra” di kurmanciya navendî de bi wateya “li gel, tevî” tê bikaranîn.” (Muhammed, 2016:26)

Mînak:

Ez ê *bi* wan *ra* herim çolê.
Bi xaltîka xwe *ra* çûye malê.
Êdî *bi* min *ra* neaxive.
Ez *bi* te *ra* naaxivim.
Ew jî *bi* wê *ra* nexweş ket.
Şêrko *bi* pismamê xwe *ra* li hev hat.
Ew jî *bi* hevalan *ra* çû golê.
Bi çîyayan *ra* diaxive kevir.
Bi dîya xwe *ra* qise dike.
Bi nêçîrvanan *ra* kabê diavêje.

Cizîrî, di helbesta xwe da ev daçek weha bi kar anîye:
“Dil geşte min ji dêrê naçim kenîşteyê qet
Mihrabê wê *bi* min *ra* wer da biçîne laleş.” (Cizîrî, 2012: 119).

Di pirtûka berhevkarîyê ya Cindî û Evdalî da, ev daçek weha hatîye bikaranîn:

“Xalê wî zergekê orta milê Kulik da dixîne hey wî,

Kerrê bira xwe *pê ra* dighîne hey wî, wî...” (Cindî û Evdal, 2008: 77).

Ji mînakan jî dîyar dibe ku, ev daçek bêhtir wateya “digel”bûnê dide. Ev digelbûn carna wateya “liberhev”ê dide carna jî wateya dualî ya “beramberî”yê dide.

Ev daçek, kêm be jî carna bi daçekên navî ra tê bikaranîn û daçekên hevdudanî dertên meydanê.

Mînak:

Bi dû ra ez ê bêm.

2.5. Bi...ve/va: Ev daçek, wateya çûn û hatina ber bi cihekî, pêrabûn, zeliqandî û xwedîbûnê dide. Di pirtûka Bedir Xan û Lescotî da, sê peywirên vê daçekê tên destnîşankirin, “Bihevribûn, xwedîbûn û pêvebûn”. (Bedir Xan û Lescot, hb.: 231). Baran jî weha qala vê daçekê dike: “Wateya çûn û hatina hêlekê û berê bûyerê diyar dike. Çûn û hatina ku tê qalkirin hîn jî didome. Herweha ev daçek zeliqînê-pêvebûnê jî nîşan dide.” (Baran, 2012: 110).

Mînak:

Bi dê û bavê xwe ve çûn.

Vî kaxidî bi dîwarî ve bikin.

Marî bi min ve da.

Aşît ber bi min ve dihat.

Nesekinin bi pêş ve herin.

Pisîk bi dîwarî ve ma.

Bi wir ve hilkişîya.

Ew bi sed siwarî ve bi rê ket.

Tu jî pê ve bide.²

Xanî di Mem û Zînê da weha cih daye vê daçekê:

“Ew şems û qemer ku muttesil bûn

Derhal-i bi yek ve muzmehil bûn” (Xanî, hb.: 554)

“Ew pêkve bi meş’el û fener çûn

Dayîn û Sifî, hinek di ber çûn.” (Xanî, h.b.: 552).

Bateyî, di mewlûda xwe da ev daçek weha bi kar anîye:

“Silsila wî ta bi Adem da û bab

Pêkve dê biçne beheştê bê hîsab” (Bateyî, 2011: 188).

² Di formê vê daçekê yê kurt da, dengê “b” û “p”yê tên guhertin.

Ev daçek gelek caran bi daçekên, “ber, bin, dû, nav, nik, paş, pêş, pey, rex, rû, ser..”ê ra tê bikaranîn û daçekên hevdudanî dertên meydane.

Mînak:

Xwe *bi pey wî* ve kir.

Ev jî *bi ser wî* ve kir.

2.6. Di: Ev daçek, têtetina nava tiştêkî an cihekî nîşan dide. Ji xeynî vê ji bo dijûnan jî ev daçek tê bikaranîn. Tan, li ser wê weha dibêje: “Ev daçek ji bilî çend biwêjan bi tena serê xwe nayê bikaranîn. Di wan biwêjan de jî bi ihtimaleke mezin paşdaçeka “de” bi domana demê re ji navê rabûye.” (Tan, hb.: 193). Bedir Xan û Lescotî jî di pirtûka xwe da weha qala vê daçekê dikin: “Peywendîya çawanî û biservekirinê dide, herweha wateya “di nav da” “li ser”ê bi awayê bihereket û bêhereket dide.” (Bedir Xan û Lescot, hb.: 234).

Mînak:

Min derman *di çavê* wê kir.

Zaliman *di hepsê* xin.

Leke *di cilê* wê gerîya.

Heskê *di stîlê* meke.

Bela xwe *di min* mede.

Kevir, *di avê* kirin.

Bela hat *di min* gerîya.

Di malê keve bira esker te nebînin.

Herweha bikaranîna wê ya nav ravekan jî heye:

Mînak:

Hespê *di* Soro

Çîyayên *di* bilind

Xanî, di Mem û Zînê da ev daçek weha bi kar anîye:

“Rabûne ve, xasekî û xadim
Hindik *di* eqarib û meharim.” (Xanî, hb.: 330).

Cizîrî di helbesteka xwe da ev daçek weha bi kar anîye:
“Gul heta sohr in bi tê ve bîn tebessum pê ve pê ve
Bilbulê serxweş *di* nêv e nexme û na û newa” (Cizîrî, 2012: 200).

Feqî, di helbesteka xwe da ev daçek weha bi kar anîye:
“Ne heval man ne çaryar man
Ne eshabê *di* xemxar man
Ne ‘alimên *di* hişyar man
Ne Calisê wefadar” (Feqî, hb.: 231).

Tê xuyakirin ku ev daçek bêhtir hundir û derbasbûna hundirê tiştan dîyar dike. Awayê wê yê ku di nav ravekê da tê bikaranîn kêr e. Ji mînakên jî dîyar dibe ku gelek caran wekî hêmaneka lêkerî tê bikaranîn.

2.7. Di.....da/de: Ev daçek, hundir û nava tiştan nîşan dide. Wextê bi peyvên demî ra bê bikaranîn wateya demî jî dide. Bedir Xan û Lescot dîyar dikin ku ev daçek wateya hundirî dide lê bi awayê bê hereket nîşan dide. Herweha wateya “wî wextî”, “wê gavê” jî dide. (Bedir Xan û Lescot, hb.: 234).

Mînak:

Di qutîyê *da* çi hebû?
Di bêrîka wê *da* mewîj hene.
Strî di destê min *da* çû.
Hal di min *da* nemaye.
Di wî wextî *da*, ez ne li wir bûm.
Di cih *da* deng li birayê xwe kir.

Xanî di Mem û Zînê da vê daçekê bi van awayan bi kar tîne.

“Xasma *di* vê esrê *da* ku hemyan
Ma’şûq û hebîb e bo me hem’yan” (Xanî, hb.: 174).

“Sirra *di* te *da* ji feyzê can e
Nûra di zemîn ji asîman e.” (Xanî, hb.: 398).

Ev daçek gelek caran bi daçekên, “ber, bin, dû, nav, nik, paş, pêş, pey, rex, rû, ser..”ê ra tê bikaranîn û daçekên hevdudanî dertên meydanê. Kurdo li ser vê weha dibêje:

“Daçeka beşa yekem a (di)yê digel daçeka (nav)ê tê bikaranîn. Her du bi alîkariya (ra)yê dikevin pêşiya navên ku di awayê rewşa hevrayî de ne yan bi alîkariya (da)yê dikevin pêşiya navên ku di rewşa cîwarî de ne. Daçeka (di)yê digel daçeka (nav)ê bê bikaranîn û çî jî neyê bikaranîn ji aliyê wateyê ve tiştek naguhere. Ev daçek bireserên ku rûdan di nav wan de diqewime nîşan dide.” (Kurdo, hb :273)

Mînak:

Di bin sîya hinarê *da* rûniştîye.
Di nav me *da* kê destê xwe neşûştîye?
Di ber min *da* xwe da girtin.

Cizîrî, di helbesteka xwe da awayê wateya vê daçekê weha bi kar tîne:

“Du reşmarên semensur bû me dil mabû d’ xiyalê *da*
Ku sinbul hat û ker ker bû *di ber* goşê hilalê *da*
Ji ‘eksa saqî enwer bû şeraba me d’ piyalê *da*” (Cizîrî, hb.: 333).

2.8. Di.....ra/re: Wateya “derbasbûna” di cih û tiştekî ra nîşan dide. Kadri Yildirim li ser wateya wê weha dibêje: “Maneya navber, derbasbûn û şopandina rêçeka dîyar dide.” (Yildirim, 2012: 274.)

Mînak:

Ew *di* gelîyekê *ra* derbas bûn.
Pitik *di* xew *ra* çûn.
Ew *di* daristanê *ra* bihurîn.

Cizîrî, di helbesteka xwe da awayê kurt ê vê daçekê, weha bi kar anîye:

“Hadîrî çûn secde jê ra lê niyet ihram ne vêra

‘Aşîqê ev gezme *tê ra* herçi ta’et kit rewa ye.” (Cizîrî: hb.: 203).

Ev daçek gelek caran bi daçekên, “ber, bin, dû, nav, nik, paş, pêş, pey, rex, rû, ser...”ê ra tê bikaranîn û daçekên hevdudanî dertên meydanê. Her yek ji van daçekan wateya xwe ya taybet lê bar dîkin. Li ser vê yekê, Kurdo weha dibêje:

“Di Kurmancî de lihevketina (di ber)ê digel nav de di awayê rewşa hevrayî de ku bi arîkarîya (ra)yê tê darijtin wî kesî nîşan dide ku rûdan li ber wî yan ji aliyê wî ve tê kirin.” (Kurdo, hb.: 265).

Di vê mijarê da, mînakên ku ew dide ev in:

“*Di ber wî ra* diborin silavan lê dîkin.”

“*Ew di ber xanîyê* bilind *ra* çûn.” (hb.: 265).

Wekî din jî hin mînakên din ev in:

Mînak:

Di bin pirê *ra* meşîyan.

Av, di ser ra çû.

Di bin çavan *ra* li me dînihêre.

Xwişka min *di ser* min *ra* ye.

Di ber min *ra* bihurî çû.

2.9. Ji: Ev daçek, derketin, çêbûn û berpêbûnê nîşan dide. Kurdo li ser peywira vê daçekê weha dibêje: “Cih û dema destpêka rûdanê nîşan dide... Ji bo keresteyên ku tiştek jê hatibe çêkirin tê bikaranîn... Peywendiya sedema rûdanê nîşan dide.” (Kurdo, hb.: 258).

Mînak:

Ji mala me derket û mala wan.

Ji mastî hatîye çêkirin.

Tu vana *ji* wê bistîne.

Feqî, di pirtûka xwe da ev daçek weha bi kar anîye:

“Rûmet hebû ew bê qiyas

Bayê evînê bir libas

Geh geh *ji* xwe davêt kiras

Ji agir û heraretê” (Feqî, hb.: 271).

Herweha ev daçek sedemê jî çêdike. Xanî, di Mem û Zînê da weha cih daye wateya vê daçekê:

“Da bêne ser hîkayeta pêş:

Xelqê ku *ji* derdê işqê dilrêş” (Xanî, hb.: 212).

Di van mînakan da wateya “derketin”, “çêbûn” û “sedem”ê hatin dîyarkirin. Herweha ev daçek wateya “berpêbûn”, “neqandinê” jî dide. (Bedir Xan û Lescot, hb.: 235).

Mînak:

Ji wî bipirse.

Ji wê bawer dike.

Yekî *ji* wan.

2.10. Ji...da/de: Ev daçek, cih û alîyê ku tevger û bûyer jê dest pê dike û tê nîşan dide. Bedir Xan û Lescot weha qalê dîkin: “Ji cihekî û pê ve, bi destpêkirina cihekî û pê de.” (Bedir Xan û Lescot hb.: 236).

Mînak:

Ew camêr *ji* jor *da* hat.

Ji vir *da* wisa xuya nake.

Ji wir û pê *da* erdê wan e.

Bateyî, di mewlûda xwe da ev daçek weha bi kar anîye:

Nê ji darê xwarin herdukan şîrîn

Hûlleyê *ji* bejnê *da* firîn” (Bateyî, hb.: 186).

Di pirtûka berhevkarîyê ya Celîl da ev daçek weha hatîye bikaranîn:

“Ez ê binî biqulpînim ser serî ye,

Ez ê bikim xelk bêjin *ji* waqetê isheba *da...*” (Celîl, hb.: 105).

Li gorî peyvên ku daçek bi wan ra tên bikaranîn wate diguhere, di mînakên jêr da, hem domandina karekî heye hem jî bidawîbûna karekî heye.

Mînak:

Ji berê *da* derdê me û wan ev e.

Ji vir bi şûn *da* em ê wisa nekin.

2.11. Ji.....ra/re: Ev daçek, wateya berpêbûn û armancê nîşan dide. Kurdo weha pênaseya vê daçekê dike: “Di Kurmancî de (ji) digel (ra)ya paşdaçeka xwe peywendiya rêçika mebestê nîşan dide. (Kurdo, hb.: 259).

Mînak:

Ew *ji* min *ra* hêkan tîne.

Ji wan *ra* bibêjin bila xwe aciz nekin.

Mamoste *ji* me *ra* qala gulan kir.

Xanî, di Mem û Zînê da ev daçek weha bi kar anîye:

“Her ev bes e, ey hebîbê muxtar

Barî *ji* te *ra* bi *ji* te sond xwar” (Xanî, hb.: 150).

Feqî, di helbesteka xwe da ev daçek weha bi kar anîye:

“*Ji* kê *ra* dikî zikrî bi hal

Qet guşguşa nakî betal

Şubhetê min rehtê êmal

Şevan û rojan xew netê” (Feqî, hb.: 115).

Tan jî weha behsa vê daçekê dike û mînakan dide: “Karê ji bo yekî/ê tê kirin û gotinê arasteyî yekî dike.” (Tan, hb.: 192).

“Zozanê *ji* Zinê *re* tu tişt negot.
Ji min re tişteki bibêje.” (hb.: 192).

Di vê daçekê da xuya ye ku her du wate jî hene. Li gor mebesta hevokê wateya armancê jî heye û wateya berpêbûnê jî heye. Di wateya armancê da peywira vê daçekê û daçeka “*ji bo*”yê eynî tişt in.

Mînak:

Ji min ra nanî bistîne. *Ji bo min* nanî bistîne.

2.12. Ji...ve/va: Ev daçek, hêla ku tevger dest pê dike û dewam dike nîşan dide. Tan, weha qala vê daçekê dike: “Tevger *ji* cihekî derdikeve û heta cihekî din diçe.” (Tan, hb.: 193). Daçeka “*ji*”yê jixwe destpêka tiştan, cihên tişt jê dest pê dikin nîşan dide. Paşdaçeka “*ve*”yê berdewamîyê jî di xwe da dihevwîne.

Mînak:

Ji te ve xuya dikir.
Ji vir ve tên.
Ji duh ve dinya ne xweş e.

Xanî, di Mem û Zînê da ev daçek weha bi kar anîye:
“Meqsûd-i ku bû *ji* pêş *ve* hazir
Dê qesd-i bikin cemîê nazir.” (Xanî, hb.: 132).

Cizîrî, di helbesteka xwe da, ev daçek weha bi kar anîye:
“Ellah li min hubba te çi şekker û nebat e
Ji nû ve dê ciwan bim ger bihn bikim gula geş” (Cizîrî, hb.: 120).

Herweha Baran dîyar dike ku wextê ev daçek, bi daçekên navî ra jî tê bikaranîn û wateyên din jî dide û van mînakên dide:
“Ew *ji ser* min *ve* ye.

Ji binî ve çû.

Ji te pê ve kes nabêje.

Ji ber min ve çû.” (Baran, hb.: 113-114).

Li vir xuya dibe ku vê daçekê wateyên wekî, “derbasbûn”, “temamî”, “ji xeynî” û “ji dêvila” jî daye hevokê.

2.13. Li: Ev daçek cih û warên ku mirov lê ye dîyar dike û wateya berpêbûnê dide. Tan, li ser peywirên vê daçekê weha dibêje: “Ev daçek tu paşdaçekan nagire û cih û warekî nîşan dide. Cihêkî ku “li” nîşan dide, cihêkî gelemperî ye, sînorên wî ne diyarkirî ne.” (Tan, hb.: 193).

Herweha Kurdo jî li ser peywira vê daçekê weha dibêje: “Daçeka (li)yê (Soranî: le) rewşa tewandî (di berhemên wêjeyî yên Soranî de awayê wê bêalî ye) û rewşa cîwarî nîşan dide.” (Kurdo, hb.: 257).

Dîyar e ku ji alîyê mayîn û lêbûnê da ev daçek û daçeka “di..da”yê xwedî heman fonksiyonê ne, lê “di..da” hundir û cihên sînorkirî nîşan dide, “li” cihên berfireh û nedîyar jî di xwe da dihevin.

2.13.1. Lêbûn

Yek ji wateya sereke ya vê daçekê diyarkirina cihêkî ye. Sînorê vî cihî berfireh e û tam nedîyar e.

Mînak:

Rojgar *li* bajarî dimîne.

Li wan deran berf barîye.

Li Rewanê helbestên wî dixwînin.

Di pirtûka berhevkarîyê ya Cindî û Evdalî da ev daçek weha hatîye bikaranîn:

“Wê şevê *li* wê derê dihêwirin...”

“Du roja *li* wir dimînin bona pak bûna Sosikê.” (Cindî, Evdal, hb.: 247).

2.13.2. Berpêbûn

Ev daçek, ji xeynî dîyarkirina cihî, berpêbûnê jî nîşan dide. Berê tevgerê ji alîyê têrkerê ve dîyar dike.

Mînak:

Li min binêhêre.

Li erebeyê siwar hat.

Wî li min pirsî.

Feqî, di helbesteka xwe da ev daçek weha bi kar anîye:

“Şêx gote wan qir qir mekin

Zikrê xwo îro purr mekin

Keyfê *li* min bê surr mekin

Xweş nîne sewta ji we tê” (Feqî, hb.: 263).

Ev daçek, gelek caran bi daçekên, “ber, bin, dû, nav, nik, paş, pêş, pey, rex, rû, ser..”ê ra tê bikaranîn û daçekên hevdudanî dertên meydanê.

Mînak:

Li cem wî çi heye çi tune ye.

Li ser xanî çi dikî?

Li paş malê gur hene.

Xalê wî li ber mirinê ye.

Hat li rex mala me xanî çêkir.

Li bin dara kizwanê rûniştîye.

Dîsa di helbesteka Feqî da awayê vê daçekê weha hatîye bikaranîn:

“Kalîn kirin xekê *li nik*

Ew pîremêr rabû sivik

Ji agir wecha di zik

Ma bê hewayê derdetê” (Feqî, hb.: 269).

Ev daçek, hin caran bi peyva “gor”ê ra qalibekê çêdike û wateya “bi”ya daçek a ku bi cînavkan ra tê bikaranîn dide.

Mînak:

Li gorî min ev ne wisa ye.

Li gorî te dê kî bi ser bikeve?

2.14. Bal: Ev daçek, wateya li cem cih û tiştekî didêre. Kurdo weha qala vê daçekê dike: “Ji alî wate û erkê ve digel daçeka (ba)yê hevta ye. Dibe ku daçeka (bal)ê ji lihevketina (ba) û (li)yê pêk hatibe, ku di vir de (i) ji nav çûye.” (Kurdo, hb.: 271).

Mînak:

Kurik çû *bal* bavê xwe.

Karik hat *bal* maka xwe.

Ez nema tîm *bal* wan.

Xanî, di Mem û Zînê da weha bi kar anîye ev daçek:

“Filhal-i evan du afîtaban

Dil çûye ve *bal* du mahîtaban” (Xanî, hb.: 272).

Ev daçek digel daçekên xwerû jî tê bikaranîn û wateyên wan li xwe bar dikin.

Mînak:

Li bal wan sûtan çî dike?

Ji bal derî xwe bide alî.

Cizîrî, di helbesteka xwe da weha bi kar tîne vê daçekê:

“Ê vi Xudrî ra divêt ava heyatê bit nesîb

Dê bi se’y û cehdê yeksan bin *li bal* wî roz û şeb” (Cizîrî, hb.: 46).

2.15. Ber: Ev daçek, wateya cihê ku bûyer ber bi wê ve diqewime didêre. Kurdo, li ser peywira vê daçekê weha dibêje: “Daçeka (ber)ê wan cihên ku di pêşî de rûdan lê diqewime yan ber bi wê cihê ve diqewime nîşan dide. (Kurdo, hb.: 265).

Mînak:

Duh bi şev hate *ber* derî.

Çû *ber* dara gûzê rûnişt.

Em nema *ber* xwe dibînin.

Cizîrî, di helbesteka xwe da weha bi kar tîne vê daçekê:

“*Ber* du birhên te ji îxlas û yeqîn

Mi dibir secde bi adabê du’a” (Cizîrî, hb.: 39).

Ev daçek gelek caran bi daçekên xwerû ra tê bikaranîn û wateyên cur bi cur didêre. Kurdo weha dibêje û nimûneyan dide: “Daçeka (li ber)ê (Sorani: le ber) digel nav di rewşa hevrayî de digel paş daçeka (da) heman wateyê dide.” (Kurdo, 2013:265).

“*Li ber* derga rawesta.

Tenê xanîkî min teng hebû, ew jî *li ber* çavê min xirab kirin.

Rindê û Zîzê *li ber* tevna mefûrê rûniştibûn.” (Kurdo, 2013:265).

Li gorî ku Kurdo dîyar dike, daçekên wekî, “ba”, “bal”, “cem”, “nik” û “rex”ê jî eynê wateyê didêrin. (Kurdo, hb.: 269).

Mînak:

Were *cem* bavê xwe.

Were *ber* bavê xwe

Ev daçek wextê bi daçeka xwerû “ji”yê ra tê bikaranîn wateya sedemê dîyar dike. Yildirim li ser wateya wê weha dibêje: “Maneya sedem, pêş û bergîdanê dide.” (Yildirim, hb.: 269).

Xanî, di Mem û Zînê da weha bi kar tîne vê daçekê:

“Meyla te ye aşiqan dikêşit

Derdê te ye dil *ji ber* diêşit.” (Xanî, hb.: 128).

2.16. Bin: Ev daçek, wateya binê kes û tiştan didêre. Kurdo, weha qala vê daçekê dike: “Daçeka (bin)ê bi lêkerên kar û kirinê re tê bikaranîn û wê bireserê destnîşan dike ku rûdan bi ser wî ve diqewime.” (Kurdo, hb.: 265).

Mînak:

Mêrik hat *bin* darê vezelîyan.

Pisîk çû *bin* maseyê.

Egît ketine *bin* berfê.

Dêrşewî, di pirtûka xwe ya berhevkarîyê da weha bi kar tîne vê daçekê: “Wê nan beht, hind pê agahdar bî lehîya rûn da *bin* teştê wê, hizir kir û jor da li nava serê min da: hey nêmao ev ne te mîzt bi xwe ve?” (Dêrşewî, 1989: 196).

Ev daçek, bi daçekên xwerû ra jî tê bikaranîn û hin wateyên din didêre. Kurdo li ser vî awayî weha dibêje û mînak dide: “Cot daçekên (li bin) (Soranî: le bin), (di bin) (Soranî: de bin) ku dikevin pêşîya navan di awayê rewşa hevrayî de bi arîkariya paşdaçeka (da)yê tînin darijtin û bireserên ku rûdan li ser wan diqewime destnîşan dikin.” (Kurdo, hb.: 266-267).

“Yekî din *di bin* erdê *da* xwey nivîne.” (hb.).

Sêrtî, di Nech-ul Enamê da weha bi kar anîye ev daçek:

“Li esmanê heft-iye cennet niha,

Cehennem *li bin* erdêye her weha” (Sêrtî, 1988: 18).

Ev daçek, bi daçekên xwerû ra tê bikaranîn û wateyên wan li xwe bar dike. Kurdo weha dibêje: “Cot daçeka (ji bin)ê (Soranî: le bin) wê bireserê nîşan dide ku rûdan ji aliyê wî ve serî hildide û dest pê dike. (Kurdo, hb.: 266-267).

Mînak:

Di bin vê behrê da çîyayên volkanîk hene.

Çû li bin sîya wê rûnişt.
Xwe ji bin dîwarî bide alî.
Xanî ji bin asasî ve hilweşî.

Ev daçek, di Nech-ul Enama Sêrtî da weha hatîye bikaranîn:
Dê eczaê cismî fena bin *ji bin*,
Ji bil 'es' esê, paşê mehşûrî bin." (Sêrtî, hb.: 18).

2.17. Bi qasî:³ Ev daçek, wateya pîvandinê, wekhevîyê nîşan dide. Baran, weha qala vê daçekê dike û mînakan dide: "Ev ji alîyê çendîniyê wateya şibandinê çêdike." (Baran, hb.: 114).

Mînak:

Ez *bi qasî* wî jîr ne jîr im.
Tu *bi qasî* wê çêbike.
Bêrîvan *bi qasî* te mezin e.

Ev daçek di romana Şivanê Kurd da weha hatîye bikaranîn:
"Karafil xizemek zêrin ê qasî polokek 5 rûbil bû û xelekek zêrin pêve kiri bû." (Şemo, 1989: 66).

2.18. Bo: Ev daçek, armanc û sedemê didêre. Kurdo, li ser wê weha dibêje: "Daçeka (bo)yê (Kurmancî: bo, bona) bi awayekî berfireh di her du diyalektan de tê bikaranîn. Wateya wê ya bingehîn nîşandan biresera ku rûdan ber bi wê rû dide herwuha mebest sedema rûdanê destnîşan dike." (Kurdo, hb.: 268).

Mînak:

Bo min meçe wan deran
Min dengê xwe *bo* te bilind kir.
Bo wan, rabû çû wan bajaran.

Bateyî, di mewlûda xwe da weha bi kar anîye ev daçek:

³ Ev daçek, bi awayê "qasî"yê jî tê bikaranîn.

“Destegîr û mustexasî herdu kewn
Bo gunehkaran penah û pişt û ‘ewn” (Bateyî, hb.: 177).

Xanî, di Mem û Zînê da weha bi kar anîye ev daçek:
“Qadir nedîbûn bikin quûdê
Gêr bûne bi yek ve *bo* sucûdê” (Xanî, hb.: 338).

Ev daçek, bi daçeka xwerû “ji”yê ra jî tê bikaranîn û dîsa eynî wateyê didêre. Carna jî wateya xatirê dide. Yildirim li ser vê weha dibêje: “Ji xeynî vê wateyê, wateya “xatir”ê jî dihevwîne. (Yildirim, hb.: 273).

“Azad ji bo te ew bexşand.” (hb.).

Wekî ku Bedir Xan û Lescot jî dîyar dikin, ev daçek wextê bi daçeka xwerû “ji”yê ra tê bikaranîn wateya armanc û sedemê nîşan dide. (Bedir Xan û Lescot, hb.: 233). Kurdo, weha qala peywirên vê daçekê dike: Dema digel daçeka (ji)yê (Sorani: le) ya beşa yekem tê bikaranîn rêçika rewşa tewandî nîşan dide... Di Kurmancî da bikaranîn û nebikaranîna wê mîna hev e.” (Kurdo, hb.: 268).

Feqî, di pirtûka xwe da, vê daçekê weha bi kar tîne.
“Qenc bû qewî ew ji we ra
Ji nam û namûsa we ra
Kafir bûna b’Şêxê we ra
Qenc bû *ji bo* eliyetê” (Feqî, hb.: 324).

Wekî ku li jor hat destnîşankirin, wateya sedemê jî heye, Ehmedê Xanî di beyteka xwe da weha ew bi kar anîye:

“Aya bi çi wechî mane mehrûm
Bîlcumle *ji bo* çi bûne mehkûm” (Xanî, hb.: 166).

2.19. Digel: Ev daçek jî wateya pêrabûnê, nîşan dide. Kurdo, weha qala vê daçekê dike û mînakên dide: “Daçeka nexwerû ya (legel) di Soranî de tê bikaranîn, di Kurmancî de hevtaya wê daçeka (digel)ê ye, di Mukrî de jî (degel) e...”

Peywendiyêke bi wan bireseran re nîşan dide ku rûdan digel wan diqewime. (Kurdo, hb.: 277).

Mînak:

Ez jî *digel* te tîm.
Digel dêya xwe çû bajêr.
Tu jî *digel* wî, nanî bixwe.
Em *digel* wan hatin.

Bateyî di mewlûda xwe da weha bi kar tîne vê daçekê:
“Tête heşrê ew *digel* xelkê berê
Ye’nî ba peyxemberê enwerê” (Bateyî, hb.: 179).

Cizîrî jî di dîwana xwe da weha bi kar tîne vê daçekê:
“Dema ew tîm bi nazî tîm *digel* qewsên şîrazî tîm
Çi mûkarên di tazî tîm bi de’wa tîm lêkdanê” (Cizîrî, hb.: 254).

Ev daçek pewyira gihanekî jî hildigire ser xwe û wateya “herçiqas”ê jî dide.

Mînak :

Digel ku me jê ra got, dîsa bi ya xwe kir.
Digel wê lêdanê jî hiş nehat sera.

2.20. Dû, pey:⁴ Ev her du daçek eynî wateyê didêrin. Wateya dûwayîya tişt an kesekî nîşan didin. Balî weha qala daçeka “dû”yê dike: “Ev daçek wateya, “Paş, pişt, li piş, ji pişt”ê dide û li gorî peywira xwe ya li nav hevokê wateya wê diguhere.” (Balî 1992: 159).

Mînak:

Ew jî êdî dide *dû* min.
Dû wî êdî em neçûn ser rezê xwe.

⁴ Ev daçek bi awayê “dûv”ê jî tê gotin.

Şivanan da *dû* kerîyê pezî.

Dêrşewî, di pirtûka xwe ya berhevkarîyê da weha bi kar tîne vê daçekê:

“Keremke pîrê, pîrê ket pêşîyê û Elaedîn ket *dûv*...” (Dêrşewî, hb.: 131).

Ev daçek, bi daçekên koma xwerû ra jî tê bikaranîn û wateyên wan jî li xwe bar dike.

Mînak:

Bi dû wî ra êdî kes nehat ser text.

Zarokên te jî *li dû* te tên.

Karik *ji dû* makan naqetin.

Kurdo li ser vê daçekê weha dibêje û mînak dide: “Daçeka (dû-diwa) digel daçekên beşa yekem (li,bi)yê (Soranî: le, be) cot dibin û di bikaranînê de ji bo çespendina wateyê bi awayekî berfireh tên bikaranîn.” (Kurdo, hb.: 270).

“Koma me *dû (li dû)* esker çû.” (hb.).

Xanî jî di Mem û Zînê da weha cih daye vê daçekê:

“Te d’go ku erûs-i eynê can e

Lew bûne beden *li pey* rewan e” (Xanî, hb.: 318).

2.21. Heta: Ev daçek, ji alîyê demê û şiklî ve sînore qewimandinan nîşan dide û carna wateya şertî jî dide. Baran weha qala vê daçekê dike: “Cîyê ku bûyer û tevger lê bi dawî dibe, digihîje asta herî dawî dîyar dike. Rewşa şertî jî çêdike.” (Baran, hb.: 114).

Mînak:

Heta neyê serê me, em fam nakin.

Heta ji te tê bişixule.

Çû *heta* devê derîyê me.

Bateyî, di mewlûda xwe da weha bi kar tîne vê daçekê:

“Girt û ba tasnîm û safî kir hevîr

Têkve da *hetta* ku ew qenc bû xemîr” (Bateyî, hb.: 184).

Kurdo jî li ser vê daçekê weha dibêje:

“Daçeka (heta)yê cihekî xwe yê taybetî heye. Taybetiya wê di wê de ye ku digel daçekên beşa yekem li hev dikevin. Daçeka (heta)yê û awayê wê yê (ta)yê ji bo Kurmancî û Soranî giştî ne, sînore serîhildana rûdanê ji aliyê mawe û demê ve nîşan dide. (Kurdo, hb.: 273).

Xanî, di Mem û Zînê da weha bi kar tîne vê daçekê:

“Herçend-i bi şev dimînî bîdar

Sibhan dinivî *heta* ve êvar” (Xanî, hb.: 376).

2.22. Nav: Ev daçek, hundirê cihên sînorkirî û girtî nîşan dide. Kurdo li ser vê daçekê weha dibêje û dide:

“Daçeka (nav)ê (Soranî: naw, nêw) bi tenê û bi cotbûna digel daçekên beşa yekem ên (li, ji, di)yê (Soranî: le, e, be) tê bikaranîn. Ev daçek rêçika rewşa tewandî, cîwarî (da) û hevrayî (ra)yê derdibire û bireserên ku rûdan di nav wan de yan ji ber wan rû didin nîşan dide.” (Kurdo, hb.: 267).

Mînak:

Dîsa ket *nav* cihê xwe.

Nav konan paqij dike.

Tu jî bikeve *nav* daran.

Xanî, di Mem û Zînê da weha bi kar tîne vê daçekê:

“Durdaneê xweh birêje *navê*

Yanî ereqa wekî gulavê” (Xanî, hb.: 180).

Ev daçek gelek caran bi daçekên xwerû ra tên bikaranîn û wateyên wan jî li xwe bar dike.

Mînak:

Hat *li nav* zarokan pal da.

Di nav werdekan *ra* bihurî.

Ji nav me te kîjan eciband?

Navê me *li nav* omet û mîletê belav kir.

Xanî, di Mem û Zînê da weha bi kar anîye ev daçek:

“Go: ‘Rabe bira, *ji nav* nivînan

Bes ah-i bike ji ber birînan” (Xanî, hb.: 248).

Ev daçek, bi daçekên xwerû ra jî tîk bikaranîn û hin wateyên dîtir didêrin, Kurdo weha dibêje û mînak dide:

“Daçeka beşa yekem a (di)yê digel daçeka (nav)ê tî bikaranîn. Her du bi arkariya (ra)yê dikevin pêşiya navên ku di awayê rewşa hevrayî de ne yan bi arîkariya (da)yê dikevin pêşiya navên ku di rewşa cîwarî de ne... Ev daçek bireserên ku rûdan di nav wan de diqewime nîşan dide.

“Ewan *di nav* bax *da* digeriyan.” (Kurdo, hb.: 268).

2.23. Paş: Ev daçek, pişt cih û tiştan dîyar dike. Kurdo weha qala vê daçekê dike:

“Daçeka (paş)ê jî di her du diyalektên Kurmancî û Soranî de tî bikaranîn, lê di bikaranînê de di her du diyalektan de hinek ciyawazî hene. Di Kurmancî de rola daçekê digêre û hinek caran jî qertafa (î)yê ya hevbendiyê yan qertafa rewşa tewandî ya zayenda mê (ê)yê digire. Di her du diyalektan de daçeka (paş)ê wê bireserê nîşan dide ku li dû wî tiştêk rû dide.” (Kurdo, hb.: 272).

Mînak:

Ji me nepirsî çû *paş* konan.

Hat ket *paş* van derîyan.

Ew jî çûn *paş* çîyayî.

Cizîrî, di dîwana xwe da weha bi kar anîye ev daçek:

“*Paş* firqetê zor muhbetê mi j’ tel’etê çûm hezretê
Wesla hebîb min bû nesîb mel’ûn reqîb rencûr-i bû” (Cizîrî, hb.: 222).

Ev daçek bi daçekên koma xwerû ra tê bikaranîn û wateyên wan li xwe bar dike.

Mînak:

Li paş xwe nêrî û meşî.

Di paş min *ra* derket.

Ji paş wan ve hat û meşîya.

Di pirtûka Celîl a berhevkarîyê da ev daçek weha hatîye bikaranîn:
“Aqilê nezanî *li paş* têt.” (Celîl, 2018.: 54).

2.24. Pêş: Ev daçek, pişt cih û tiştan dîyar dike. Bedir Xan û Lescot weha qala vê daçekê dikin û mînakên didin: “Pêşber, li hember, li hemberî wê, pêş (pêşî, derve, rû, ber) li pêş (bi hereket û bê hereket). Bikaranîna ‘pêş’ê û wateya ‘ber’ê jî dihevwîne.

“*Pêş* min de, di pêşiya min de
Bêbextiya xwe pêş çavê min kir.” (Bedir Xan û Lescot, hb.: 295).

Wekî din jî hin mînakên din ev in:

Mînak:

Xwe da pêş wî û got bimeşin.

Hunera xwe pêş me kir û nepeyivî.

Feqî, di helbesteka xwe da weha bi kar anîye ev daçek:

“Me’rîfetê teftêş bikin

Pirsan li bûna *pêş* bikin

Wan qisetan vetêş bikin

Li ‘arîfan kerahetê” (Feqî, hb.: 123).

Bateyî di mewlûda xwe da bi vî awayî bi kar anîye ev daçek:

“Gotî Adem: Ey Xwedawendê felek

Min divêtin bêne *pêş* min ew melek” (Bateyî, hb.: 185).

Ev daçek bi daçekên koma xwerû ra tê bikaranîn û wateyên wan li xwe bar dike.

Mînak:

Bila *ji pêş* artêşê yek were.

Gundê din *li pêş* me ye.

Şervan dîsa *bi pêş* wan ketin.

Xanî, di Mem û Zînê da vê daçekê weha bi kar tîne:

“Zînhar-i me her du bûk û zavan

Bêqedr nekî *li pêşê* çavan” (Xanî, hb.: 544).

2.25. Pişt: Ev daçek wateya rûyê cih û tiştêkî û wateya “paş” cih û tiştêkî didêre.

Mînak:

Pisîk çû *pişt* derî.

Hat ket *pişt* min.

Hat *pişt* malan sekinî.

Cizîrî, di dîwana xwe da weha bi kar tîne vê daçekê:

“Qewî sohtîme fîraqa ewê ahûbeserê

Kefte *pişt* perde û sitrê nema êdî bi derê” (Cizîrî, hb.: 351).

Ev daçek digel daçekên xwerû jî tê bikaranîn û bi kîjan daçeka xwerû ra bê bikaranîn, wateya wê daçekê jî li xwe bar dike.

Mînak:

Bi pişt te ra ez ê jî bêm.

Li pişt xwe nihêrî û meşî.

Ew *di pişt* wî ra kêr kirin.

Xanî, di Mem û Zînê da weha cih daye wateya awayê vê daçekê:

“Zava bi edeb ku çû ji der dan
Şem’a ku *li pişt* hîcab û perdan” (Xanî, hb.: 336).

2.26. Pêşber/Hember: Ev daçek, ji bo cih û tiştan wateya ceberê, wateya rûqalê didêre.

Mînak:

Were *pêşber* camêrê delal.
Pêşber min mesekine wisa.
Pêşber çemê Sasonê şer derket.

Cizîrî, di dîwana xwe da ev daçek weha bi kar anîye:
“Were *pêşber* Melayê xwe şehîd û muhtelayê xwe
Bi şefqet ke liqayê xwe Mela nemrit bi dayê xwe” (Cizîrî, hb.: 280).

Feqî, di pirtûka xwe da weha bi kar tîne vê daçekê:
“Ji Hêşetê bi derkevîn
Pansed murîd bi ber kevîn
Pêşber keça dilber kevîn
Zayil bikin vê hesretê” (Feqî, hb.: 273).

2.27. Ser: Ev daçek wateya “ser” cih û tiştan dîyar dike. Kurdo weha dibêje: “Daçeka (ser)ê beşek yan aliyê jor ê tiştan nîşan dide.” (Kurdo, hb.: 263).

Mînak:

Şivanî pez birin *ser* avê.
Çûk firîyan *ser* darê.
Dew rijîya *ser* sifreyê.

Xanî, di Mem û Zînê da weha ci dide vê daçekê:
“Hilgirtine *ser* serê xwe ew mehd
Dest dest direvan ji hev bi sed cehd” (Xanî, hb.: 318).

Di pirtûka berhevkarîyê ya Celîl da, ev daçek, di gotineka pêşîyan da weha hatîye bikaranîn:

“Cêrê avê *ser* rîya abê dişkê.” (Celîl, hb.: 23).

Ev daçek digel daçekên xwerû jî tên bikaranîn, wateyên wan jî di xwe da dihevin.

Mînak:

Li ser erdê şer kirine.

Bi ser min da meqîre.

Lihêfa xwe *ji ser* xwe da alî.

Xanî, di Mem û Zînê da weha bi kar tîne vê daçekê:

“Weqtê ku me di zeman e ev reng

Fîlcumle *li ser* diravî bu ceng.” (Xanî, hb.: 174).

Di diwana Cizîrî jî da jî bi vî awayî hatîye bikaranîn:

“Me *ji ser* çeşmeyê heywan qedehek safî vexwar

Nagihê lezzet û zewqa me bi sed cildê kitab.” (Cizîrî, hb.: 41).

Ev daçek wextê daçeka xwerû “bi...da/de”yê ra tê bikaranîn, tevgera ber bi jêr dîyar dike. Kurdo li ser vê weha dibêje: “Daçeka lêkder a (bi ser) (Sorani: be ser) û (li ser)ê (Sorani: le ser) ku digel nav tên bikaranîn bi arîkariya paşdaçeka (da)yê rewşa cîwarî pêk tînin û rêçika jor ber bi jêr destnîşan dikin.” (Kurdo, hb.: 264).

Xanî, di Mem û Zînê da weha bi kar anîye ev daçek:

“Îstebreq û sundusin di ber da

Çend mi’cer meqreme *bi ser da*” (Xanî, hb.: 228).

Wextê ev daçek bi daçeka xwerû “di...ra/re”yê ra tê bikaranîn, ji cihekî bilind wateya derbasbûn û çûnê didin. Kurdo li ser vê weha dibêje û mînakan dide: “Cot daçeka (di ser)ê digel nav û bi alîkarîya paşdaçeka (ra)yê rewşa hevrayî pêk tîne. Di

vê rewşê de cihê bilind yan ber bi bilindiyan ve nîşan dide. Ev cure lihevketin tenê di Kurmancîya jorîn de tê bikaranîn.” (Kurdo, hb.: 264).

“Alên miletê berxwe di ser kelat û bajarên wan ra li pêl dibin.

Du hêstirên germ, di ser hinarikên wê re çûn.” (hb.).

2.28. Wekî/Fena/Mîna/Nola: Ev her çar daçek eynî wateyê didêrin. Ev daçek wateya şibandina dirûvî dide. Bedir Xan û Lescot dîyar dikin ku bi lêkera “man”ê ra eleqedar e û wateya şibandinê dide. (Bedir Xan û Lescot hb.: 237). Peyvên wekî “*mîna, fena, nola*”yê jî heman wateyê didin.

Mînak:

Wekî şêran şer dikir.

Wekî min bixwîne.

Ev ne *wekî* te ye.

Tu jî *wekî* wî bireve.

Wekî ku min digot bike.

Xanî, di Mem û Zînê da weha cih daye vê daçekê:

“Ew bûte egerçi tengena ye

Sehrayê *fîna* yê dilguşa ye.” (Xanî, hb.: 628).

Cizîrî jî di dîwana xwe da, di beytekê da vê daçekê weha bi kar tîne:

“Nisbet peri ziba ye ew *wek* nêrgiza yekta ye ew

Ya men rea xillî fe hel, yuşbi bi şey ‘în qameta” (Cizîrî, 1987: 33).

Dîsa Feqî, helbesteka xwe da, weha cih daye vê daçekê:

“Geryan *wekî* dolaba aş

Sekinî li dor şêx pêş û paş

Da xaçperest bêne temaş

Ji ‘eskera temaşe tê” (Feqî, hb.: 281).

Ev daçek di pirtûka berhevkarîyê ya Celîl da, weha di nav destanekê da hatîye bikaranîn:

“Wê jî *wek* carîyê wa şewqa elbê da dî.” (Celîl, hb.: 184).

BEŞA SISÊYAN

PEYWIRÊN DAÇEKAN

Daçek, ne bi tenê ji hinek alîyan ve wateyan li peyvê bar dikan. Di çêkirina navdêr û lêkeran da hêmaneka kartêker in. Gelek lêkerên hevdudanî, bi alîkarîya daçek û cînavkan hatine çêkirin. Daçek, ji xeynî çêkirina navdêr û lêkeran, bi peywira hoker û gihanek û rengdêran jî radibin. Herweha daçek di nava cotepeyvan da jî tîbî bikaranîn û vegotinê hêsantir dikan. Ciwan, peywirên daçekan weha pêname dike:

“Daçek bi tena serê xwe wateyên wan nîn in, lê wextê ku di nav hevokan da bi peyvên din ra tîbî bikaranîn hêmanên nû yê wateyî çêdikin û hinekî din jî rola xwe eşkerî dikan. Daçek, di nava hevokê da wekî hêmaneka serbixwe jî tîbî bikaranîn û rengdêr, lêker yan jî hokerên nû çêdikin. Di Kurmancî da jî ber daçek di gelek waran da hene, girîngiya wan zêde ye. Heke mirov daçek û bikaranîna wan baş nezane, axaftin û nivîsîn ne pêkan e.” (Ciwan, 1992:139).

Hêmanên din, gelek caran bi alîkarîya daçekan peywira xwe bi cih tînin. Yek jî peywira daçekan, alîkarî ye. Daçek alîkarîya hêmanên din ên hevokê dikan. Jixwe wextê hêmanên hevokê tîbî veqetandin, em rasterast daçekan destnîşan nakin. Badilli li ser alîkarîya daçekan weha dibêje: “Daçek, alîkarîya peyvên ku bi wan ra tîbî bikaranîn dikan, herweha alîkarîya komhevokan û awayên bikaranîna hevokan û awayên derbirînan dikan. Ji ber vê, navdêr û lêker bêjeyên eslî ne û daçek jî peyvên alîkar in.” (Badilli, 1965:138).

3.1. Navdêr û Daçek

Navdêr, ew hêmana rêzimanê ye ku liv û tevgerê di xwe da nahewîne û bi vî awayî jî lêkeran vediqete. Navdêr, bi sê awayan teşe digirin, xwerû, pêkhatî û hevdudanî. Pêşdaçek, di çêkirina navdêran da kartêker in. Pêşdaçekên “bî”, “bê” “dî” “jî”, “lî”yê jî bo çêkirina navdêran tîbî bikaranîn. Şwanî di pirtûka xwe ya rêzimanê

da weha qala vê peywîrê dike: “Ji bo mebestên cuda tê bikaranîn. Hinek ji wan di dariştina peyvan de beşdarî dikin û di hevokê de jî rola wan çalak e.” (Şwanî, 2001:175). Daçek, bi gelek awayan navan çêdikin, bi rayekên lêkeran ra tîn bikaranîn, li navdêran zêde dibin, di nava peyvên hevdudanî da cih digirin wan digihînin hev. Li ser çêkirina peywîra daçekan Baran weha dibêje: “Daçekên “bi- bê-, li-“yê wek qertaf tîn pêşîya hinek navdêr û lêkeran. Ev qertaf wateya peyvê diguherînin.” (Baran, 2012:50).

Tan jî li ser peywîra daçekan a pêşgirîyê weha dibêje: “Her wekî me di mijara peyvسازیê de jî diyar kir, gelek caran hokerên mîna “ser-”, “bin-”, “ber-”, “nav-” û daçekên mîna “bi” û “bê” û “ne” jî karê pêşgiran pêk tînin.” (Tan, hb: 101).

Peyvên mîna, “ber, bin, ser, der, pêş, paş, pey, şûn, ser, bal, pişt, nav...”ê ji çavkanîyên ku me dabûn jî dîyar in ku daçekên navî ne. Ev daçekên navî hem dibin pêşgir hem jî dibin paşgir û peyvên nû çêdikin.

3.1.1. Peyvên ku bi alîkarîya pêşdaçekan hatine çêkirin

Ji daçekên koma xwerû, pêşdaçekên “bi, bê di, li, ji”yê tîn pêşîya navdêran û ji wan navdêrên nû çêdikin. Ev cure navdêr ji ber ku ji yekê zêdetir hêmanan pêk tîn, navdêrên hevdudanî ne.

Mînak:

Bikir, bikuj, lirê, jiber, dibûr, bêkar, kîjan...

Bikir ez im firoşkar kî ye?

Ew li dibûran disekine.

Kîjanî pirsar me kir?

Ji daçekên xwerû û cînavkên nîşanî, “pê, jê, lê, tê” dertîn meydanê. Ev awayên kurtkirî hem tîn pêşîya navdêran û hem jî tîn pêşîya lêkeran û ji wan peyvên nû çêdikin.

Mînak:

Jêbir, lînûs, lêçûn, pêgir, pêxwas, tîgîn, tîketin...

Mîn ji vê tîgînê fam nekir.

Jêbira min bi kû da çû?

Lênûs ji destê wê çû.

Di bikaranîna bi vî awayî da, peyv rola rengdêran hildigire ser xwe.

Mînak:

Devbixwîn, karbidest, nelirê, çavlîder...

Ev ê devbixwîn îcar bela xwe bi kê da?

Ev nelirêti li me nayê.

Çalîder e, çavlîder, xwelî li sera be.

3.1.2. Peyvên ku bi alîkarîya daçekên navî hatine çêkirin

Daçekên navî “ber, ser, bin, pêş, paş, wek, mîna...” jî gelek ji wan hem tên pêşîya navdêran û hem jî tên paşîya navdêran û ji wan navdêrên nû çêdikin.

Mînak:

Serban, berger, bindîz, serbar, bindarok, binketin, pêşmal, paşgo, pêşketin, paşketin, wekhev, mînak...

Serban qul be, binban şil e.

Em îro çûn bindarokan.

Pêşmala xwe paqij bike.

Wekî Ebdulfettah jî amaje ê dike, nimûneyên wan pir kêr bin jî hinek peyv, piştî ku pêşdaçek ketîye, paşdaçek bi wan ve maye û ketine dirûvekî din.

Çira (ji çi ra), derva (ji der va) (Ebdulfettah, 2006:42).

3.2. Cînavk û Daçek

Cînavk ew hêmanên rêzimanê ne ku cihê navan digirin, li şûna wan tên bikaranîn. Daçek, di mijara cînavkan da jî kartêker in. Cînavkên lihevxiştî bi alîkarîya daçekan tên çêkirin. Herweha gelek cînavkên din jî bi daçekan ra tên bikaranîn û wateyan li xwe bar dikin. Pêşdaçekên “bi” “di” “li” û “ji”yê bi cînavkên kesîn û nîşanî bi “wê”, “wî”, “vê” “vî”yê ra awayê ewil ên cînavkên lihevxiştî çêdikin. Ebdulfettah weha qala vê yekê dike:

“Cînavên nîşandanê ‘vî, vê, wî, wê’ û yên kesîn ‘wî, wê’ ku li pey pêrbestan ‘ji, li, bi, di’ bikar bên, ew cînav û pêrbest bi hev re tên kurtkirin û pevxistin û bi vî şêweyê jêrîn tên xebitandin: jê, lê, pê, tê. (Ebdulfettah, 2006 a:63-64).

Ev daçek, wextê bi cînavka “hev”ê ra tên bikaranîn awayê diduyan ên cînavkên lihevxiştî çêdikin û wextê bi cînavka “êk”ê ra –ku ew jî wateya cînavka “hev”ê didêre– tên bikaranîn awayê sisêyan ê cînavkên lihevxiştî derdikeve meydanê. Ev cînavkên lihevxiştî, carna bi tena serê xwe tên bikaranîn gelek caran jî bi wan peyvên nû tên çêkirin. Ebdulfettah weha qala vê dike: “Dema ku ev her çar pêrbest ‘ji, li, bi, di’ dikevin ser cînavên hevayî, pêrbest û cînav tene kurtkirin û pevxistin.” (Ebdulfettah, 2006:70).

3.2.1. Bi Cînavkên Kesîn

Pêşdaçekên “bi” “di” “li” û “ji”yê, wextê bi cînavkên kesîn “wê/wî-vê/vî”yê ra tên bal hev, bi alîkarîya wan awayê ewil ê cînavkên lihevxiştî derdikeve meydanê. Bedir Xan di pirtûka xwe da vê agahîyê jî dide: “Ev pronavên ha bi tenê yekejmarê dinimînin û nikarin bikevin şûna gelejmarê.” (Bedirxan, 1998:80). Cînavkên lihevxiştî bi vî awayî tên çêkirin:

Bi+wê/wî - vê/vî → Pê

Di+wê/wî - vê/vî → Tê

Ji+wê/wî- vê/vî → Jê

Li+wê/wî- vê/vî → Lê

Bedir Xan weha qala wan dike:

“Herçî daçek ‘ji, li, bi, di’ ne. Herçî pronav an ‘vî, vê, wî, wê’ ne ‘hev, êk”in. Ji lewre ev pronavên ha du tofan ditînin pê.”

Tofa pêşîn: *jê, lê, pê, tê*

“Min jê stand: min ji vî stand, min ji wî stand, min ji vê stand, min ji wê stand.

Min lê pirsî: min li vî pirsî, min li wî pirsî, min li vê pirsî, min li wê pirsî.

Min pê karî bû: min bi vî karî bû, min bi wî karî bû, min bi vê karî bû, min bi wê karî bû.

Min tê da: min di vî da, min di wî da, min di vê da, min di wê da.” (Bedir Xan, 1998:79-80).

Hin mînakên dîtir ev in:

Minak:

<i>Bi wê tiştekî binivîse.</i>	→	<i>Pê tiştekî binivîse.</i>
<i>Kefçiyê di şorbê meke.</i>	→	<i>Kefçiyê tê meke.</i>
<i>Keviran ji bîrê derxe.</i>	→	<i>Wan jê derxe.</i>
<i>Tu jî li pirtûkê binêre.</i>	→	<i>Tu jî lê binêre.</i>

3.2.2. Bi Cînavkên Berbihevîn

Pêşdaçekên “bi” “di” “li” û “ji”yê, wextê bi cînavkên berbihevîn “hev” û “êk”ê ra tên bal hev, bi alîkarîya wan, awayên din ên cînavkên lihevxiştî derdikevin meydana. Tan di vê babetê da weha dibêje: “Daçek û cînavkên berbihevîn(hev/êk) dibin yek û cureyekî cînavkên lihevxiştî pêk tînin.” (Tan, hb.: 142).

Bi “hev”ê

Bi+hev → Pev

Di+hev → Tev

Ji+hev → Jev⁵

Li+hev → Lev

Herweha Bedir Xan, di pirtûka xwe ya gramerê da van mînanan dide:

“Me *jev/jêk* stand: me *ji hev/êk* stand.

Me *lev/lêk* pirsî: me *li hev/êk* pirsî.

Me *pev/pêk* nikarî bû: me *bi hev/êk* nikari bû.

Me *tev/têk* da: me *di hev/êk* da.” (Bedir Xan, 1998:80).

Mînak:

Di hev çûn seyranê. *Tev* çûn seyranê.

Te ew *bi hev* guhertin. Te ew *pev* guhertin.

⁵ Di awayê “li+hev” û “ji+hev”ê da ji bo zimanê nivîskî awayê kurtkirî nayên bikaranîn.

Torbeyê me <i>ji hev</i> çû.	Torbeyê me <i>jev</i> çû.
Ew dîsa <i>li hev</i> hatin.	Ew dîsa <i>lev</i> hatin.

Awayên cînavkên berbihevîn zêde ne, lê heman wateyê didêrin, Ebdulfettah li ser vê weha dibêje: “Diyar e ku ev cînavên bêhêl ‘hev, êk, hevûdu, êkûdu’ hevwater ne. Anku her çar cînav bi wateya hev in.” (Ebdulfettah, 2006:70).

Bi “êk”ê

Bi+êk → Pêk
 Di+êk → Têk
 Ji+êk → Jêk
 Li+êk → Lêk

Mînak:

Ew <i>bi êk</i> ve ye.	Ew <i>pêk</i> ve ye.
Ew <i>di êk</i> çûn.	Ew <i>têk</i> çûn.
Hûn <i>ji êk</i> bipirsin.	Hûn <i>jêk</i> bipirsin.
Çiqas <i>li êk</i> û di hat.	Çiqas <i>lêk</i> hat.

3.3. Lêker û Daçek

Hêmanên rêzimanî ên ku di xwe da tevger û liv û rewşê dihevinin û li gorî deman raweyên wan hene lêker in. Tan lêkerê weha pênase dike: “Lêker ew cureyê bêjeyê ye ku bi awayekî rêzimanî hêmana sereke ya pêveberê ye û bizavekê yan rewşekê nîşan dide.” (Tan, hb.: 205). Daçek, di çekirina lêkerên hevdudanî da kartêker in. Hem pêşdaçek û hem bazinedaçekên xwerû hem jî daçekên navî di çekirina lêkeran da hêmanên bingehîn in.

3.3.1. Lêkerên ku bi alîkarîya pêşdaçekan hatine çekirin

Di awayê ewil da, daçekên xwerû, tên pêşîya lêkerên xwerû û hin navdêran û bi vî awayî, lêkerên nû tên çekirin. Hin lêkerên ku bi alîkarîya pêşdaçek û navdêran hatine çekirin ev in:

Awayê Ewil

Di awayê ewil da, pêşdaçek tên ber hêmanên navî û bi alîkarîya lêkerêkê çêdibin.

Binavkirin, bibîranîn, bibîrxistin, bikaranîn, libabûn, libaketin, lidarxistin, jibîrkirin...

Mînak:

Min ew bi nav kirin.

Te jî ew bi bîr xist.

Zarok ji ber wê çû.

Awayê Diduyan

Di awayê diduyan da, pêşdaçek tevî cînavkan tên pêşîya hin lêkerên xwerû û ji wan lêkerine nû tên çêkirin. Hin lêkerên ku bi alîkarîya cînavk û daçekan hatine çêkirin ev in:

Jêbirin, jêçûn, jêketin, jêhatin, jêgerîn, jêbûn, pêdaketin, pêderxistin, pêsekinîn, pêketin, pêhisîn, lêhatin, lêborîn, lêgerîn...

Mînak:

Nivîsa depê jê bir.

Ew jî hat û lê gerîya.

Em jî pê disekinîn.

3.3.2. Lêkerên ku bi alîkarîya bazinedaçekan hatine çêkirin

Bazinedaçek, tevî cînavkên nîşanî tên bikaranîn û berî hêmana lêkerî tên û lêkerine nû çêdikin.

Pêdaçûn, têraçûn, pêvedan, dixewraçûn, bidarvekirin, birêvebirin, biserdakirin.

Mînak:

Nûçeya xwe xwend û pê da çû.

Ez jî bi wan ra di xew ra çûm.

Wan ew kal jî bi dar ve kir.

3.3.3. Lêkerên ku bi alîkarîya daçekên hevdudanî hatine çêkirin

Daçekên xwerû û navî û hevdudanî, gelek caran tên pêşîya hêmanên lêkerî û lêkerine nû çêdikin. Ebdulfettah li ser vê yekê weha dibêje: “Karên lêkdayî ji hevalkarên cîgehî⁶ û hindek karan pêk tên.” (Ebdulfettah, 2011:33).

Awayê Ewil

Di awayê ewil da, daçekên navî bi pêşdaçekan ra tên bikaranîn, bi alîkarîya hêmana lêkerî, lêkerekê nû tê çêkirin. Hin ji wan lêkeran ev in:

Biserketin, bipêşketin, bipaşketin, binketin, bipêşketin, liberxwedan, liberketin, paşketin,

Mînak:

Binketina xwe xist stûyê me.

Ew jî *dixwazin* di xwendinê da pêş bikevin.

Ew jî êdî li ber xwe didin.

Awayê Diduyan

Di awayê din da, daçekên navî bi bazinedaçekan ra tên bikaranîn, bi alîkarîya hêmane lêkerî, lêkerekê nû tê çêkirin. Gelek lêkerên biwêjî dîsa bi vî awayî hatine çêkirin.

Diserraçûn, diberdamayîn, biserdaketin...

Mînak:

Ew pir bi ser da dikeve.

Ava me dîsa di ser ra çû.

Xarin di ber da ma.

Lêkerên biwêjî jî gelek jê bi alîkarîya van daçekan tên pê. Herweha ji cînavkên lihevexistî yên ku bi alîkarîya daçekan hatine çêkirin, gelek lêkerên biwêjî hatine çêkirin. Tan li ser vê yekê weha dibêje:

⁶ Hevalkarên cîgehî, ango hokerên cîgehî ew cure nav in ku bi gelek peywiran radibin.

“Bi alîkarîya cînavkên lihevxiştî gelek lêkerên biwêjî pêk hatine. Ev cure lêker ji çend hêmanan pêk hatine, cînavkên lihevxiştî wateya wan sergihayî dikin. Ev cure lêker jî du cure ne; hinek ji wan bi alîkarîya cînavkên lihevxiştî yên bi daçek û cînavkên berbihevîn, hinek jî bi cînavkên lihevxiştî yên bi daçek û cînavka “ê” pêk hatine.” (Tan, hb.: 145).

Hin mînakên di vê mijarê da ev in:

Mînak:

Bi agir dileyîze.

Bi darê zorê.

Bi ber bayê wan ket.

Pir li ber gerîya.

Li xwe hay nîn e.

Ji pertav ketin.

Ji pey naqete.

3.4. Rengdêr û Daçek

Rengdêr, ew hêmanên rêzimanî ne ku navan ji alîyê reng, teşe, rewş, hejmar û îşaretê ve dîyar dikin. Bedir Xan rengdêrê weha pênase dike: “Rengdêr ew bêje ye ko bi navdêrê ve dibe û wesfekî wê dide zanîn; an wê navdêrê di mana wê de tayîn dike û teksîs dike.” (Bedir Xan 1998:89). Gelek peyvên ku bi alîkarîya daçekan hatine pê, bi peywira rengdêran radibin. Di rengdêran da, gelek caran raveber radibe û raveker tenê dimîne. Tan di vê derbarê da weha dibêje: “Hin caran daçekek tê ber navdêrekê yan jî dikeve navbera du navdêran û hevalnavekê pêk tîne.” (Tan, hb.: 161). Hin ji wan rengdêrên ku bi alîkarîya daçekan tên çêkirin ev in:

Binavkirî, bécir, bêkes, bênamûs, bêar, nelirê, devliken, dilbiêş, jidil, libar, liberşîr, bêçêj, likar, limal, lihevnêr, jîbergir...⁷

Mînak:

Ew kesê *bécir* bi kû da çû?

Ew çi merivekî *bêar* e.

⁷ Di van mînakên da dîyar e ku raveker ketîye, “Kesê bécir, bûye bécir.”

Evan karên *nelirê* neyînin ber me.

3.5. Hoker û Daçek

Hoker, ew hêmanên rêzimanî ne ku ji alîyê cih, hêl, wext û rewşê ve tesîrê li ser lêkeran çêdikin. Balî li ser pênaseya hokeran weha dibêje: “Hoker, ew bêje ne ku wateya rengdêr, lêker û hêmanên mîna wan xurt dikin.” (Balî 1992:145). Gelek peyvên ku bi alîkarîya daçekan hatine çêkirin, bi peywira hokeran radibin. Xusûsî wextê hêmanên hevokan ji hev tîne veqetandin, pirsên wekî “çiqas”, “çawa”, “kengî” û hêmanên ku cih û alîyan nîşan didin dibin hoker. Tan li ser vê yekê weha dibêje: “Hoker bi çend awayan pêk tîne, bi alîkarîya daçekan û bi alîkarîya paşgir û pêşgiran.” (Tan, hb.: 181). Hin hokerên ku bi alîkarîya daçekan tîne çêkirin ev in:

Mînak:

Di biharê da tê malê.
Ez ji bo te diçim.
Bi roj were mala me.
Mîna însanan nan xwar.
Ji îro pê ve ez li dersê dişixulim.
Ji ber te ev tişt hat serê me.
Camêr bê hemdî ket xwarê.
Zarok mal bi mal gerîyan.
Çûk ref bi ref firîyan.
Dewî bi tasê vexwar.
Ji nişkê ve derket derve.
Ew bixwe çêbû.
Jixwe tu pirsî me nakî.
Di cih da deng li min kir.

3.6. Gihanek û Daçek

Gihanek, ew hêmanên rêzimanî ne ku peyv û hevokan digihînin hev. Biçûk, weha dibêje: “Gihanek, peyveke neguhêrbar e. Du peyvan, du hevokan yan jî, peyv û hevokekê bi hev girê dide.” (Biçûk, 1977:244). Hinek hêmanên ku bi daçekan

çêbûne, carna bi peywira gihanekan jî radibin. Ev gihanekên ku bi alîkarîya daçekan hatine çêkirin bi piranî di nav du hevokan da cih digirin.

Baran, di mijara gihanekan da weha qala rola daçekan dike: “Bi ser de: Ev gihanek ji daçekan pêk hatîye, asta bilindbûn û zêdebûna kirin û tevgerê nîşan dide û hevokan bi hev ve girê dide.” (Baran, hb., 2012:120).

Mînak:

Nan neda me *bi ser da* dengê xwe li me bilind kir.

Em nehatin dibistanê *ji lew ra* berf dibarî.

Herçiqas me got jî guh neda me.

Ji ber ku nehat me dengê xwe nekir.

Her kes di xew da ma, *digel vê yekê* em dîsa çûn.

BEŞA ÇARAN

DENGANÎYA DAÇEKAN

Denganî, beşek ji beşên dengzanîyê ye ku li ser awayê çêbûn û guherîna dengên radiweste. Aksan li ser dengzanîyê weha dibêje: “Dengzanî, ew zanist e ku li ser awayê derketina dengên însanan, li ser çawanîya wan, li ser ragihandina wan, li ser veguhaztina wan a ji bo guhdaran disekine.” (Aksan, 2007: 26). Denganî jî bêhtir li gorî peywirên xwe guherîn û veguherîna dengên a li nav zimanekî vedikole. Daçek jî wextê di nava hevokê da bi peyvên din ra tên bikaranîn, carna dengên wan tên guhertin, carna kurt dibin, carna tîp û hêmanên wan dikevin. Di vê beşa hanê da em ê li ser kurtbûn, guherîn, ketin, tewang û awayên dengê daçekan bisekinin.

4.1. Kurtbûna Daçekan

Daçek, wextê bi cînavkan ra tên bikaranîn yan jî wextê ku peyva piştî xwe di xwe da dihevin gelek caran kurt dibin. Di awayê kurt da, hinek caran tîpên dengdar ên pêşdaçekan diguherin û dengdêr ji wan dikevin.

Daçek, wextê bi cînavkên nîşanî ra tên bikaranîn û kurt dibin û cînavkên lihevxiştî dertên meydanê. Bedir Xan weha qala vê dike: “Ji pronavên nêtar hinên din hene ko ji wan re pronavên lihevxiştî dibêjin. Ji ber ko ew bi lihevxiştina daçek û pronavekê têne pê.” (Bedir Xan, 1998: 72).

Wê/wî

Bi+wê/wî: pê

Di+wê/wî: tê

Ji+wê/wî: jê

Li+wê/wî: lê

Mînak:

Bi wê nê dixwe. Pê nan xwar.

Di wê werbû. Tê werbû.

Ji wê hez dike. Jê hez dike.

Li wê binêre. Lê binêre.

Ji ber ku pêşdaçekên wan eynî ne, ev kurtbûna hanê, di bazinedaçekan da jî çêdibe.

Mînak:

<i>Bi wê</i> da çû.	<i>Pê</i> da çû.
<i>Bi wî</i> ra axivî.	<i>Pê</i> ra axivî.
<i>Bi wê</i> ve kir.	<i>Pê</i> ve kir.
<i>Di wê</i> da çi heye?	<i>Tê</i> da çi heye?
<i>Di wî</i> ra çû.	<i>Tê</i> ra çû.
<i>Ji wî</i> da xuya nake.	<i>Jê</i> da xuya nake.
<i>Ji wê</i> ra bibêje.	<i>Jê</i> ra bibêje.
<i>Ji wî</i> ve xuya ye.	<i>Jê</i> ve xuya ye.

Daçek, ji xeynî cînavkên nîşanî bi cînavkên “hev” û “êk”ê ra jî tên bikaranîn û awayên wan ên kurt derdikevin meydana. Tan, weha qala vê dike: “Daçek û cînavkên berbihevîn (êk / hev) dibin yek û cureyekî cînavkên lihevxiştî pêk tînin.” (Tan, hb.: 142).

Hev

Bi+hev: pev
Di+hev: tev
Ji+hev: jev
Li+hev: lev

Mînak:

Min ew <i>bi hev</i> guhertin.	Min ew <i>pev</i> guhertin.
Bi wî ra <i>di hev</i> digere.	Bi wî ra <i>xwe tev</i> digere.
Min ew <i>ji hev</i> xist.	Min ew <i>jev</i> derxist.
Ew îro <i>li hev</i> hatin.	Ew îro <i>lev</i> hatin. ⁸

Êk

Bi+êk: pêk
Di+êk: têk
Ji+êk: jêk
Li+êk: lêk

⁸ Di nivîsê da gelek caran awayê “li hev” û “ji hev”ê tên tercîhkirin bêhtir di çêkirina peyvan da jî bo sivikkirina û di awayê zimanê devkî da “lev” û “jev” tên bikaranîn.

Mînak:

Ew tişt <i>bi êk</i> hat.	Ew tişt <i>pêk</i> hat.
Her du jî <i>di êk</i> çûn.	Her du jî <i>têk</i> çûn.
Ew <i>ji êk</i> ve bûn.	Ew <i>jêk</i> ve bûn.
Ew tişt <i>li êk</i> anîn.	Ew tişt <i>lêk</i> anîn.

4.2. Guherîna Dengê Daçekan

Daçek, wextê bi cînavkan ra tên bikaranîn û cînavkên lihevxiştî dertên meydanê, hin dengdarên wan ên serî tên guhertin. Di pêşdaçekan da dengê “b”yê bi “p”yê, dengê “d”yê bi “t”yê tê guhertin. Ebdulfettah li ser vê weha dibêje: “Ji hêla dengsazîyê (fonetîkê) ve jî, sedema ku tîpa ‘b’ û ‘d’ bi cînavê ‘ê’ re dibin ‘p’ û ‘t’ ew e, ku cîderê dengê ‘p’ û ‘t’, ji cîderê dengê ‘b’ û ‘d’, nêzîktirî cîderê dengê ‘ê’yê ye.” (Ebdulfettah 2006: 67).

Bi+wê/wî: pêDi+wê/wî: têBi+hev: pevDi+hev: tevBi+êk: pêkDi+êk: têk**Mînak:**

<i>Bi wê</i> nanî bixwe.	<i>Pê</i> nanî bixwe.
Bela xwe <i>di wê</i> nede.	Bela xwe <i>tê</i> mede.
Ew dîsa bi hev ketin.	Ew dîsa pev ketin.
Wan <i>di hev</i> bide.	Wan <i>tev</i> bide.
Ew tişt <i>bi êk</i> nehat.	Ew tişt <i>pêk</i> nehat.
Em jî êdî <i>di êk</i> çûn.	Em jî êdî <i>têk</i> çûn.

Herweha wextê daçek di nava ravekan da tên bikaranîn, daçeka “li”yê cihê xwe dide qertafa “î”yê. Baran li ser vê weha dibêje: “Carinan di hinek hevokan de “*li*”ya daçek kurt dibe û peywira veqetandekê digire ser xwe û dibe “*î*”. (Baran, hb.: 17).

Mînak:

Telefon <i>li</i> min kir.	Telefonî min kir.
Rast <i>li</i> wî hat.	Rastî wî hat.
Bang <i>li</i> te kir.	Bangî te kir.

4.3. Ketina Tîp û Hêmanên Daçekan

Di daçekên xwerû da wekî dengdêr tîpên “i”, “a”, “e”yê hene. Tîpa “i”yê gelek caran di pêşdaçekan da ye, tîpên “a” û “e”yê jî di paşdaçekan da ne. Ev tîpên dengdêr li gorî bikaranînê sivik dibin û dikevin. Daçek wextê bi cînavkên nîşanî ra dibin yek û kurt dibin ji xeynî guhertina dengên wan tîpa wan a dengdêr “i” jî dikeve. Wekî din tîpên paşdaçekan jî wextê pêşdaçek bi peyva berî xwe ra bê gotin dikevin. Ji xeynî ketina dengên pêşdaçek û paşdaçek jî dikevin.

4.3.1. Ketina Tîpên Daçekan

Daçek wextê tîpên kurtkirin tîpa daçekên xwerû “i” ji “bi, di, li, ji”yê dikeve. Bi ketina wê ra dengdara daçekê jî diguhere. “i” jî ber ku tîpeka kurt e, li ber dengdêrên dirêj nikare bisekine loma dikeve.

Wê/wî

Bi+wê/wî: pê

Di+wê/wî: tê

Ji+wê/wî: jê

Li+wê/wî: lê

Mînak:

<i>Ji wê bigere êdî.</i>	<i>Jê bigere êdî.</i>
<i>Tu jî li wê binêre.</i>	<i>Tu jî lê binêre.</i>
<i>Em bi wê naşixulin.</i>	<i>Em pê naşixulin.</i>
<i>Ew di wê ketê.</i>	<i>Ew tê ketê.</i>

Hev

Bi+hev: pev

Di+hev: tev

Ji+hev: jev

Li+hev: lev

Mînak:

<i>Ew çima bi hev ketin?</i>	<i>Ew çima pev ketin.</i>
<i>Karê wî li hev gerîya.</i>	<i>Karê wî lev gerîya.</i>
<i>Ew makîne di hev ket.</i>	<i>Ew makîne tev ket.</i>
<i>Ew jî êdî ji hev in.</i>	<i>Ew jî êdî jev in.</i>

Êk

Bi+êk: pêk

Di+êk: t êk

Ji+êk: j êk

Li+êk: l êk

Mînak:

Ew tişt *bi êk* hat. Ew tişt *p êk* hat.

Ew *ji êk* bûn. Ew *j êk* bûn.

Camêr *di êk* çû. Camêr *t êk* çû.

Karê me *li êk* hat. Karê me *l êk* hat.

Herweha di gotinê da ji ber sivikkirinê dengê dawî yê paşdaçekan jî dikeve. Ji ber ku bi peyvên berî xwe ra di carekê da tên xwendin, dengdêr dikeve.

“Mîn ê j’ şevê wî şevê êx de hoyê hoyê lê dişewirî...” (Meretowar, 2017: 112).

4.3.2. Ketina Pêşdaçekan

Di zimanê devkî da ji ber sivikkirinê û di awayê çêkirina hinek peyvên da pêşdaçek gelek caran dikevin û nayên bikaranîn. Wextê pêşdaçek dikevin gelek caran paşdaçek tenê dimîne û bi peyvê ve tê nivîsîn.

Mînak:

(*Ji*) min *ra* wisa negot.

(*Di*) vir *da* (*di*) wê *da* dike.

(*Bi*) dû *ra* ez ê bêm bal te.

Vîya (*bi*) dîwar *ve* bike.

Hûn (*bi*) xêr hatin.

Ew jî çû (*ji*) der *ve*⁹

Jinik (*ji*) çî *ra* pîrsa te nake?

4.3.3. Ketina Paşdaçekan

Di zimanê devkî da, gelek caran ji ber sivikkirinê paşdaçek nayên bikaranîn. Herçiqas paşdaçek neyên bikaranîn jî pêşdaçek bi peyvê ve nayê nivîsîn. “Di

⁹ Di peyvên wekî “derve” û “çira”yê da paşdaçek bûye qertafa eslî a wan peyvên û bi wan ra tê nivîsîn.

daçekan da pirî caran pêşdaçek dikeve. Hin caran paşdaçek jî dikeve.” (Baran, 2017:6)

Mînak:

Ber bi malê (ve) çû.

Me kêfxweşî di hev (da) da.

Wî bela xwe di min (da) dida.¹⁰

Di awayê bikaranîna deman da, carna paşdaçek û pêşdaçek bi hev ra dikevin.

Mînak:

Çerçî (di) biharê (da) tê mala me.

Ew (di) êvarê (da) pirsar şîvê dîkin.

Baran, di gotareka xwe da weha qala ketina paşdaçekan dike û mînakan dide: “Wextê ku cînavk dikevin nava daçekan, carna tîpa dengdar a daçekê dikeve, tîpên cînavkê jî dikevin û tîpa dengdêr a daçekê bi cînavkê ve tê nivîsîn.

Ji min *ra* got.

Ji *ma* got.

Ji te *ra* dibêjim.

Ji *ta* dibêjim.” (Baran, 2017:5-6)

4.4. Tewang û Daçek

Tewang, rewşa dîyarkirî ya peyvan e ku bi qertafên “î”, “ê”, “an”ê tê çêkirin û zayend û mêjerê dîyar dike. Yek ji mijara ku bi daçekan ra eleqedar e, mijara tewangê ye. Qertafên tewangê sisê ne: “-î”, “-ê”, “-an” û zayenda û mêjera peyvan dîyar dîkin. Tan li ser vê weha dibêje: “Taybetîyeke daçekan ev e ku peyvên piştî xwe ditewînin. Peyva guherbar di kîjan demê de li pey daçekekê bê, ditewe.” (Tan, hb.: 194). Di Kurmancî da, peyv di nava hevokê da bi du awayan tê bikaranîn, awayê xwerû û awayê tewandî. Daçek gelek caran peyva piştî xwe dîkin bin hikmê xwe û wê ditewînin, herweha peyvên ku dikevin nava bazinedaçekan jî tîpên tewandin. Hagêge li ser vê yekê weha dibêje: “Daçek weku navgînên rêzimanî, pêwendîya navbera du hêmanên risteyekê nîşan didin, dikarin bîna pênasêkirin ku daçekê yek ji wan xistiye bin hukmê xwe.” (Hagêge, 2010:1) Piştî daçekan cînavk bîna, ew jî cînavkên tewandî ne. Di vê babetê da bi tenê hoker îstîsna ne, gelek caran hokerên ku piştî daçekan tîpên nayên tewandin. Daçekên pîrsê jî ji ber ku bi peywira pîrsê radibîna, peyva piştî xwe natewînin.

¹⁰ Di beşa daçekên xwerû da qala daçeka “di”yê hatibû kirin, di eslê xwe da, paşdaçeka wê heye, lê hin bikaranînan zimanî carna qaîdeyên nû çêdîkin.

Mînak:

Li malê nê dixwe.
Ji Berîvanê ra dibêje.
Li gundî şer heye.
Ji destê me derket.
Wekî camêran nanê xwe xwar.
Heta sibehê em li benda te bûn.
Di quşxaneyê da çi heye?
Bi wî her gav xweş tê.
Bi wan neleyîze.

Daçek bixwe, wextê bi hev ra tîk bikaranîn, gelek caran hevdu natewînin. Hinek ji wan êdî bûne qalib.

Mînak:

*Ji paş min derket.*¹¹
Li ber derî çi dike?
Di ser min ra bû.

4.5. Awayên Dengên Daçekan

Di Kurmancî da, bazinedaçek ji du hêmanan pêk tîk û peyv dikeve navbera wan. Ev bazinedaçek, “bi... da/de”, “bi... ra/re”, bi... ve/va”, “di... da/de”, “di... ra/re”, “ji... da/de”, “ji... ra/re” û “ji... ve/va” ne. Daçek ji xeynî peywira alî, hêl, mayîn, jêderketin, berpêbûn û pêrabûnê, wekî di beşên din da jî hatin dîyarkirin, xwedî gelek peywiran in. Ji ber vê yekê jî ji alîyê dengî ve tesîrê li ser aheng û kafiyya hevokan jî dîkin. Di zimanê nivîskî da, daçek ji alîyê dengî ve bi du awayan tîk bikaranîn. Di awayê ewil da, tîpa dawî ya bazinedaçekan “a” ye, di awayê duyem da jî tîpa dawî ya bazinedaçekan “e” ye. Li gelek herêmên Kurdistanê, li Qafkasya û li Xorasanê jî îro roj piraniya kurmancan, van daçekan, li gorî awayê “a”yê, bi kar tînin. (Muhemmed, :2016) Di edebîyata klasîk da jî serdestiya “a”yê heye. Bedir Xan û Lescotî herçiqas di pirtûka xwe ya rêzimanê da behsa berfirehiya dengê “a”yê kiribin jî wan bixwe tercîha xwe li ser “e”yê kirîye. (Bedir Xan û Lescot hb.: 228). Di vê mijarê da gelek nîqaş hene û hîn jî berdewam in. Mustefa Reşîd jî li ser vê guhertinê di nivîseka xwe da, weha dibêje:

“Mamostayê mezin Mîr Celadet Bedirxan ev şêwe -li gor baweriya min- ji ber du sedeman hîlbijartîye: Ji ber ku sivik û hêsan e. Ji ber ku di zaravayê

¹¹ Ji bo ku tevlihevî dernekeve, daçek qertafên veqetandekê nagirin, “Pişt min”, “Pişt min”.

Botî de wisa sivik tê bilêvkirin. Ji ber wê jî, em îro di zimanê standard de şeweyê sivik bi kar tînin. Lê belê rastiyeke din jî heye, ku piraniya gelê Kurd heya niha jî hên van paşdaçekan bi şeweyê bingehîn, şeweyê “a” bilêvdike. Di Kurmanciya Navîn de jî bi şeweyê “a” tên bilêvkirin. Li Behdînan, li Hekarî û ji Beyazîd heya Meraş û Efrînê gişt bi awayê “a” dibêjin. Ji ber wilo jî, di gelek gotar û nivîsaran de em rastî şeweyê “a” dibin. Lê belê, heke em dixwazin zimanê xwe standard bikin, divêt em paşdaçekan jî bi yek şeweyî binivîsin. Bi dîtina min –tevî ku kurdên herêma ez jê hatime şeweyê “a” bi kar tînin – divêt em şeweyê sivik, şeweyê “e”, yê ku Mîr Celadet Bedixan pêşneyar kiriye, di zimanê standard de bi kar bînin. Heke rojekê ji rojan, dezgeheke fermî û nawendî ya zimanê kurdî biryarek girt û got, ku li gor prînsîpên demokratiyê, yan ji ber sedemeke zanistî divêt em şeweyê “a” bi kar bînin, hîngê rewşeke din peyda dibe. Lê belê tiştê herî berbat ew e, ku mirov di hin nivîsaran de rastî şeweyekî têkil tê. Yanê mirov dibîne, ku xwediyê gotarê, hin caran şeweyê “e” û hin caran jî şeweyê “a” bi kar aniye.” (Reşîd, 2008:1)

Sedemên ku Mustefa Reşîdî destnîşan kirine, “sivikkirin” û “hêskirin” in. Mustefa Reşîd bixwe jî awayê “a”yê bi kar tîne û berê gotinê dide biryara dezgeheka fermî û navendî ku ew jî xwe dispêre prensîbên demokratîk û sedemên zanistî. Wekî ku di nivîsa wî da jî xuya dibe û ew ji xwe ra dike palpişt, yek jê awayê bikaranîna Kurmancîya navîn e, a din jî ew e ku li gelek deverên ku Kurd lê dijîn awayê “a”yê tê bikaranîn. Mustefa Reşîd bikaranîna her du awayan a di tekstekê da, xelet dihesibîne.

Rojan Hazim jî, di pêşgotina pirtûka xwe ya bi navê, “Devokê Hekarîya” da li ser vê meseleyê disekine û weha dibêje:

“Wekî tete zanîn hindek daçek taxim in, wekî “di / da; bi / ra”. Di piraniya mezin ya zaravayê Kirmancî da, piştî pêşdaçekên “di” û “bi”, paşdaçekên “da” û “ra” tên. Bo nimûne; “di nav da”, “bi wî ra”, an jî “rê di nav tûnêlê ra dibore”, “av bi ser da hat”. Lê li rojavaya Cizîrê û hindek navçekên berîya Mêrdînê ev paşdaçek wekî “de” û “re”, anku “di nav avê de”, “bi wî re” tên bilêvkirin. Heke li piraniyê biçin, di seda nehwêt [not] û pênc yê zimanê axivtinê da, bi giranî û berfirehî “da” û “ra” tênê gotin. Lê ji ber ku Celadet Bedir Xanî gotîye, “de” û “re”, êdî av û derav hatine sekinandin, “da” û “ra” hatine avêtin! Hal ew e ku, eve daçekên cêmik [twin] in. Di timamî tekstên edebîyata klasîk da ev formên “da” û “ra” hatine bi kar înan. Lê digel hindê jî, madem navçekeke lokal “de” û “re” dibêjin û Celadet Bedir Xan jî ew form bi kar înane, bila wekî daçekên cêmik di firehiya zaravayê Kirmancî ya nivîskî da bêne bi kar înan... Celadet Bedir Xanî bi

xwe, gava ku tekst bo wî dihatin ku di Hawarê da bêne weşandin, dest li wan daçekên cêmik nedaye û cih daye van daçekên cêmik ku paralel bi kar bên. Di Hawarê da nimûneyên bi vî rengî gelek in, ku ji xwe Mem û Zîna Ehmedê Xanî bi van daçekên “da” û “ra” hatiye nivîsîn û her bi vî rengî jî di Hawarê da hatiye weşandin. (Hazim, 2004).

Li gorî fikra Rojan Hazimî, ji sedî nod û pêncê Kurmancan awayê “a”yê bi kar tînin, Celadet Alî Bedir Xan li gorî piraniya gelê Kurd neçûye û lokal maye. Çimkî awayê “de” û “re”yê bêhtir li rojavayê Cizîrê û li hinek navçeyên berîya Mêrdînê heye. Herweha, Rojan Hazim berê me dide edebîyata klasîk ku di wan berheman da bi temamî “da” û “ra” ne. Di Hawarê da, Celadet Alî Bedir Xanî cih daye herdu awayan jî. Ango wî qet negotîye awayê “a”yê şaş e. Rojan Hazim jî vê pêşniyarê dike û dibêje, sansurê neyînin ser awayê “a”yê û bihêlin bila her du jî bên bikaranîn.

M. Emîn Bozarslan, di pirtûka xwe ya bi navê *Baxçê Zimên* da li ser vê meseleyê disekine, dibêje awayê “e”yê, li zimanê me nake, piştî xwe dide edebîyata Kurdî a klasîk û folklorê, gelek mînakên dide û weha dibêje:

“Wek ku tê zanîn, ev her du paşbendikên me yanî “da” û “ra”, gelek caran ji alîyê hin nivîskar û rojnamevanên Kurd ve bi awayê “de” û “re” tên nivîsîn... Lê belê ew awa ne li awayê peyvîna piraniya gelê Kurd tê, ne jî li awayê edebîyata Kurdî ya klasîk û folklorê Kurdî tê. Lewra li gora piraniya peyvîna gelê Kurd û li gora edebîyata klasîk û folklorê Kurdî, ev her du paşbendik “da” û “ra” ne. (Bozarslan, 2008: 193).

M. Emîn Bozarslan, awayê piraniya gelê Kurd, edebîyata Kurdî a klasîk û folklorê Kurdî ji xwe ra dike palpişt. Lê M. Emîn Bozarslan, qala “va”yê nake û di nivîsên xwe da li gorî edebîyata klasîk “ve”yê bi kar tîne. Di klasîkan da herî pir qalibên, “di...da”, “bi...da” û “ji... ra”yê hatine bikaranîn. Bikaranîna daçeka “”va/ve”yê jixwe pir hindik e.

Dengê “e”yê kurt e, dengê “a”yê dirêj e. Ev awa tesîrê li ser gotinê û hevoksazîyê dike. Wextê ku piştî dengdêrên dirêj dengdêrên kurt tên, bilêvkirina wan zehmet e û herweha wextê mirov, di vê çarçoveyê da li mînakên klasîkan dinêre, mirov baş tê digihîje ku ji alîyê daçekan ve, qafîye û arûza edebîyata Kurdî ya klasîk li gorî awayê “a”yê hatiye lêkirin. Li ser vê mijarê Perwîz Cîhanî jî di nivîseka xwe da vê guhertinê wek şaşîyekê dest nîşan dike û weha dibêje:

“Celadet Bedirxan li ser wê bawerê ye, ku daçek û paşpirtikên wekî: da, ra, va, ... debê bi şeweya: de, re, ve... bêne nivîsînê, ku ew jî çewt e û binêşa wê ya devokî heye. Dema ku mirov li ser zimanê kurdî lêkolîne dike, mirov dibîne, ku ji Îrewanê bigire ta ‘Efrînê, ji wir bigire ta Kirmanşah

û Dêhloran û Mêhranê, ji wêdê bigre ta Şîraz û Xurasanê hemû kurmanc û Soran û Goran û Lek û Lor û bigire Fars jî van daçek û paşpirtikan bi dengdêra “A” bi lêv dikin. Tenê çend devokên dorûberên Cizîrê da ew rewşa rabêjtinê heye. Lê tişteki pirr girînge di heye, ew jî rewşa kewnetoreya kurdî ye. Eger em wê rênivîsa Celadetî bipejirînin, bi sedan û belkû bi hezaran kêş û qafîye û wate li helbest û kewnetoreya me ya nivîskî û heylo li toreyê me ya zarkî da dê xewîşdar û birîndar bibin. Ji, ‘Elîyê Herîrî bigire, ji Seyîdî Hewramî bigre ta Elîyê Berdeşanî û ta Cigerxûnî û bi sedan hozanên kurd “DA, RA, VA” bi kar birine. Hindek kesên ku haya wan ji şeweya edebîyata vehûnandî tune ye û tişteki ji kêş û qafîya û ‘erûzê nizanin, hindek helbestên kurdî tîpguhêz kirine, û korkorane li dû vê rêbazê ra çûne û bi sedan helbestên kurdî ji kêş û qafîyê xistine.” (Cîhanî, 2012).

Weku Perwîz Cîhanî jî diyar dike, di zaravayên Kurmancî û Farisî jî, dengê daçekan li ser awayê “a”yê ye. Zaxoyî di pirtûka xwe da rêzimana Kurdî da bi awayê “a”yê cih da van daçekan. (Zaxoyî, 2008:181-182-183) cih daye Dîsa Cîhanî destnîşan dike ku li gelek deverên kurdnişîn îro roj awayê herî pir tê bikaranîn berbelav e, awayê “da” û “ra”yê ye. Wekî Cîhanî diyar dike, ev awa tesîra xwe li ser aheng û kafiye hevokê jî çêdike ku di edebîyata klasîk da kêş û arûza hevokê li ser vê ya hatîye avakirin. Di vê babetê da eger em ji Xanî mînakê bidin:

“Ez mame di hîkmeta Xwedê da
Kurmanc-i di dewleta dinê da
Aya bi çi wechî mane mehrûm
Bîlcumle jibo çi bûne mehkûm!” (Xanî, hb.: 166).

Di herdu malikên ewil da, dengê ku ahengê çêdike “a”ye. Rîtm, li ser wê ye. Di navbera “a”ya peyva “mame” û “hîkmeta”yê û “a”ya daçekan da ahengek he ye. Deng xwe li hevdu digirin û peyv pirî caran li gorî ahenga wan dengan tên tercîhkirin.

Melayê Cizîrî, li Botan maye û wî di dîwana xwe da, awayê dengê “a”yê bi kar anîye. Eger em ji dîwana Melayê Cizîrî mînakê bidin û wan dengan biguherin dê kêşa arûzê xirab bibe û qafîyeya helbestê jî hev bike,

“Ger dilber û wer ‘aşîq in ‘arîf di vê da sadiq in Ayîneyê nûra Heq in cih cih di wan da cilwe da” (Cizîrî, hb.: 309).

Ev malik dê piştî guhertinê dê weha bibin,

“Ger dilber û wer ‘aşîq in ‘arîf di vê de sadiq in Ayîneyê nûra Heq in cih cih di wan de cilwe da”

Piştî guhertinê hem wezna arûzê ya, “Mustefîlun Mustefîlun Mustefîlun

Mustefî ilun"ê xirab dibe û hem jî ahenga dengê "a"yê ji hev dikeve. Loma jî divê li ser awayê bikaranîna dengên daçekan lêkolînên zanistî û qadî û dîrokî bên kirin da ku biryareka tekuz û baş bê dayîn.

Tiştê ku ji paşdaçekên "da" û "ra"yê ra dibe palpişt gelek in, wekî ku di gotaran da jî dixuye, îro roj li gelek herêmên Kurdistanê paşdaçekên "da" û "ra"yê tên bikaranîn. Celadet Alî Bedir Xan jî di nîşeyeka xe da vê yekê dîyar dike. Di berhemên edebîyata klasîk da, bi giştî ev daçek hatine bi kar anîn, wextê em li keresteyên folklorîk dinîhêrin dîsa ev yek derdikeve pêşberî me. Wekî ku di gotaran da jî hatibû dîyarkirin, di daçekan da dengê "a"yê, di zaravayên Kurdî da jî û di Farisî da jî heye. Daçek, ne wekî peyv in û guhertina wan zehmet e. Ji ber ku wekî xerca dîwarî hevokan digihînin hev û ne pir berçav in. Li gorî frekansa xwe jî dengê "a"yê dirêj û ji dengê "e"yê bilindtir e ku ev jî di denzanîyê da dibe avantaj ji bo dengê. Sedemên ku Mustefa Reşîd dîyar dike û ew bixwe jê bi guman e, sivikkirin û hêskirin e ku ew jî nabe krîtereka zanistî.

ENCAM

Daçek, beşeka piralî û berfireh a rêzimanê ye ku bi gelek peywiran radibe. Bi tena serê xwe tu wateya wê tune ye lê wextê di nav hevokê da bi peyvên din ra tê bikaranîn, wan ji hêla “cîh û alî”, “mayîn” “jêderketin”, “berpêbûn”, “mêjer”, “şibandî”ê ve dîyar dike. Ji xeynî van awayên dîyarkirî, daçek gelek wateyên din jî li peyvan bar dîkin.

Ji hêla sazûnê ve, daçek dibin daçekên xwerû, daçekên hevdudanî û daçekên navî. Daçekên xwerû ên pêşdaçekî, “bi, bê, di, ji, li” û yên bazinedaçekî, “bi...da/de, bi...ra/re, bi...va/ve, di...da/de, di...ra/re, ji...da/de, ji...ra/re, ji...va/ve” ne. Ev daçek wextê bigihîjin hev û bi daçekên navî ra bîna bikaranîn daçekên hevdudanî derdikevin meydanê ku ew jî ji hêmanekê zêdetir in, “li ser, di ser ra, di bin ra...”.

Daçek herçiqas ji alîyê wateyê ve, wateyên li jor dîyarkirî bidin jî, ew wateyên cur bi cur jî didêrin. Di vê xebatê da, me wateyên gelek daçekên xwerû, daçekên navî û daçekên hevdudanî dan. Wextê mirov bi giştî li van wateyên daçekan dinêre, mirov dibîne bê hevoksazîya Kurdî çawa ji gelek alîyan ve di bin tesîra daçekan da dimîne. Mînakên ji klasîkan û mînakên folklora Kurdî awayê baş ê bikaranîna daçekan berçav dike. Di vê babetê da tiştê ku wekî kêmanî li ber çavên me ket ew bû ku, çavkanîyên ku me li wan nihêrî, bi berfirehî cîh nedabûn daçekan û mijara daçekan pir kurt hatibûn vegotin. Ji lew ra di vê babetê da, ji alîyê Kurmancî ve, Qanatê Kurdo û Celadet Alî Bedir Xan û Roger Lescot li ser vê mijarê sekinîbûn, loma me xwe gelek caran li van her du berhemên girt.

Daçek di nav hevokê da, bi peyvên din ra tîna bikaranîn û wateyan li wan bar dîkin. Ew gelek caran bi cînavkên nîşanî û cînavkên berbihevîn ra tîna bikaranîn û hin awayên kurt derdixin meydanê. Di vî awayî da tîpî ji daçekan dikevin û hin dengên wan tîna guhertin. Awayê kurt ê van daçek û cînavkan, dibin cureyê cînavkên lihevxiştî. Ev awa, di zimanê Kurdî da ji ber ku kurt in pir tîna bikaranîn. Gelek caran di hevoksazîyê da, awayê kurt tîna tercîhkirin. Daçek ji xeynî peywira xwe ya li nav hevokê, bi awayê pêşgirî û paşgirî tîna bikaranîn û hinek navdêrên nû jî ji wan tîna çêkin. Wextê mirov bala xwe dide lêkerên hevdudanî ên Kurdî, mirov dibîne ku gelek lêker bi alîkarîya daçek û cînavkan hatine çêkin ku hejmara wan gelekî zêde ye. Gelek lêkerên biwêjî jî dîsa bi alîkarîya daçek û cînavkan hatine çêkin. Daçek, gelek caran bi peywira rengdêrê radibin û tîna ber hinek peyvan û ji hêla çawanî û çendîniyê ve wan dîyar dîkin. Herweha, daçek ji ber ku ji alîyê demê, hêl û alîyan ve jî tesîrê li gotinê dîkin, ew bi peywira hokeran jî radibin. Gelek hokerên demê û yên

hêl û alîyan ji bi alîkarîya daçekan pêk hatine. Daçek, carna bi peywira gihanekan jî radibin, hinek gihanek rasterast ji daçekan hatine çêkirin.

Denganîya daçekan jî yek ji mijareka girîng a daçekan e ku tesîrê li ser tercîha awayê bikaranîna daçekan dike û ahenga hevokê jî dike. Daçek ji ber ku di gotinê da pir tîr bikaranîn û pratîze bûne, ew gelek caran kurt dibin. Di vê kurtkirinê da bêhtir dengê wan ê dengdêr dikeve. Di guherîna dengê daçekan da jî dengê “d”yê cihê xwe dide dengê “t”yê, dengê “b”yê jî cihê xwe dengê “p”yê.

Awayên dengên daçekan, mijareka gelek girîng e di nav vê babetê da, ji ber ku li ser mijarê gelek nîqaş hatine kirin û tîr kirin, me jî ew nîqaşên heyî dan ber hev û li gorî wê yekê berçav kirin. Standardîzasyona zimanî ya ji alîyê daçekan ve, bi vê mijarê ra eleqedar e. Loma jî me xebatên ku di vî warî da derketine dan ber hev û qenaeta wan a giştî dîyar kir.

Di vê xebata me da, em ji çar alîyan ve li ser daçekan sekinîn, yek jê mijara cih û sazûna wan bû ku di gelek xebatan da pir kêr qala wan hatibû kirin. A din ji hêla wateyî ve daçek bûn ku heta ji me hat me wateyên gelek daçekan yek bi yek dan û me ji edebîyata klasîk û folklorê nimûne dan. Yek ji mijara muhîm jî peywira daçekan bû ku bi rêya têkilîya, cînavk, hoker, gihanek, rengdêr û lêkeran derdiket holê ku heta niha em rastî mijareka bi vî awayî nehatine. Bêguman, ev mijar dê rê li ber xebatên taybet ên daçekan veke ji lew ra daçek bi vê taybetîya xwe ji gelek beşên rêzimanê vediqetin. Mijara dawî ku em li ser sekinîn, danganîya daçekan bû, ev hêmana rêzimanî ya ku herî pir tê bikaranîn, helbet li gorî bikaranînê rastî bûyerên danganîyê jî dihatin. Di beşa danganîyê da jî em li ser guherîn û ketin û awayên dengên daçekan sekinîn û me ew jî berçav kirin.

Daçek, yek ji mijara herî girîng û pîralî ya rêzimanê ye û lazim bû ku ji hemû alîyên xwe ve bihata analîzkirin. Bi vê xebatê me hewl da ku em rê li ber vê yekê vekin. Helbet di mijara sazûna daçekan da rayên cihê cihê hene, lê li gorî xebatên heyî çarçoveya sabûna daçekan derdikeve meydana û me di vê xebata xwe da ew çarçove kir bingeş. Analîzkirina wateyên daçekan jî yek ji beşa bingeşîn a vê xebatê bû ku di pirtûkên rêzimanî pir zêde cih jê ra nehatibû veqetandin. Têkilîya daçek û hêmanên din ên rêzimanê û danganîya daçekan jî yek ji mijara herî muhîm e ku lazim e gelek xebatên dîtir jî li serê bîr kirin. Di vê babetê da jî em bi awayekî berfireh li ser vê mijarê rawestîyan. Sîstematîzekirina daçekan a bi vî awayî, dê balê bêhtir bikişîne ser mijara daçekan û xebatên dîtir.

ÇAVKANÎ

- Akın, S. (2013). *Lêkolînên Zimannasîya Kurdî*, Stenbol, Weşanên Avestayê.
- Aksan, D. (2007). *Her yönüyle Dil, Ana Çizgileriyle Dilbilim*, Ankara, Türk Dil Kurumu Yayınları.
- Amêdî, S. B. (2012). *Rêzimana Kurdî, Kurmancîya Jorî û Jêrî Ya Hevberkirî*, Stenbol, Weşanên Dîwanê.
- Balî, A. (1992). *Kürtçe Dilbigisi, Rêzimana Kurdî*, İstanbul, Alan Yayıncılık.
- Baran, B. (2012). *Rêzimana Kurmancî*, Stenbol, Weşanên Belkîyê.
- Bateyî, M. H. (2011). *Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*, M. Xalid Sadînî (amd.), Stenbol, Weşanên Nûbiharê.
- Badilli, K. (1965). *Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri*, Ankara, Ankara Basım ve Cilt Evi.
- Bedir Xan C. A. (1998). *Elfabêya Kurdî Bîngêhên Gramera Kurmancî*, Stenbol, Weşanên Dozê.
- Bedir Xan, C. A., Lescot, R. (1997). *Kürtçe Dilbilgisi*, Stenbol, Weşanên Dozê.
- Biçûk, S. (1977). *Rêzimanê Kurdî (Kurmancî)*, Berlîn, Weşanên Întîtûta Kurdî.
- Bozarslan, M. E. (2008). *Baxçê Zimên*, Stenbol, Weşanên Dozê.
- Celîl, C. (2018). *Gotinên Pêşîyan*, Stenbol, Weşanên Wardozê.
- Celîl, C. (2018). *Zargotina Kurdên Sûrîyeyê*, Stenbol, Weşanên Wardozê.
- Cindî, E., Evdal, E. (2008). *Folkloru Kurmanca*, Stenbol, Weşanên Avestayê.
- Ciwan, M. (1992). *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi*, Stockholm, Weşanên Jiyana Nû.
- Cizîrî M. (2012). *Dîwan*, Emîn Narozi (amd.) Stenbol, Weşanên Avestayê.
- Cizîrî, M. (1987). *Dîwan*, Stockholm, Weşanên Roja Nû.
- Dêrşewî, M. M. (1989). *Mîştaxa Çiya, Ji Gotinên Pêşîya*, Stockholm, 1989.
- Ebdulfettah, D. (2006). *Cînav di Zimanê Kurdî de*, Stenbol, Enstituya Kurdî ya Amedê.
- Ebdulfettah D. (2011). *Kar (lêker)*, Stenbol, Enstituya Kurdî ya Amedê.
- Meretowar A. (2018). *Huseynê Farê, Jîyan û Kilam*, Stenbol, Weşanên Wardozê.
- Hacieminoğlu N. (2015). *Türk Dilinde Edatlar*, İstanbul, Bile Kültür Sanat Yayınları.
- Hagége, Clause (2010). "Adpositions", Oxford University Press. Oxford/New York.

Heine B., & Kuteva T. (2007). *The Genesis of Grammar A Reconstruction*. New York: Oxford University Press.

Kurdo, Q. (2013). *Rêzimana Kurdî Kurmancî-Soranî*, Zülküf Ergün (wer.), Stenbol, Weşanên Nûbiharê.

Kurzon, Dennis & Adler, Silvia. (2008) "*Adpositions Pragmatic, semantic and syntactic perspectives*", John Benjamins Publishing Company, Amsterdam/Philadelphia.

Ozyurt, Guneş Muhip. (2016). "*Adpositions Derived From Nouns In Iranian Languages*", in J-FLTAL, cild 3. Hejmar 1.

Şwanî, R. (2001). *Çend Babetêkî Ziman û Rêzimanî Kurdî, Hewlêr, Dezgay Çap û Billawkirdnewey Mukriyan*.

Tan S. (2011). Tan, Samî *Rêzimana Kurmancî* Stenbol, Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê.

Teyran, F. (2009). *Jiyan, berhem û Helbestên Wî*, Xalid Sadînî (amd.), Stenbol, Weşann Nûbiharê.

Xanî, E. (1968). *Mem û Zîn*, M. Emîn Bozarslan, (amd.) Stenbol, Gün Yayınları.

Xanî, E. (2005). *Mem û Zîn*, M. Emîn Bozarslan, (amd.) Stenbol, Weşanên Dengê.

Yildirim, K. (2012). *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi*, Mardin İstanbul, Artuklu Üniversitesi.

Zaxoyî, R. Î. (2008) *Rêzimana Kurdî-Qewaîdil Luxel Kurdiyye*, Dihok, Spîrêz.

Zîlan, R. (1991). *Kurmancî, Kurmancî Rojname*, hjm. 9., Stenbol, Weşanên Avestayê.

ÇAVKANÎYÊN DÎJÎTAL

Baran. B. (2017). Cudatîyên Zimanê Devkî û Nivîskî Di çarçoveya Berhevkarîya Folklorê Da,

<http://www.amidakurd.net/pel/Bahoz.pdf>

(serîlêdan, 02.05.2018)

Baran B. (2016). Pirsgirêka Dengê Daçekan,

<http://www.amidakurd.net/pel/Pirsgir%C3%AAka-Deng%C3%AA-Da%C3%A7ekan.pdf>

(serîlêdan, 02.05.2018)

Cîhanî P. (2012). Şaşîyên rênivîsa gorrbihîşt Celadet Bedirxanî,

http://www.amidakurd.net/ku/tekst/%C5%9Fa%C5%9F%C3%AEy%C3%AA_n_r%C3%AA_niv%C3%AEsa_gorrbih%C3%AE%C5%9Ft_celadet_bedirxan%C3%AE

(serîlêdan, 02.05.2018)

Hazim Rojan(2004). “Birek ji devoka pêşgotina pirtûka Devoka Hekarîya”,

<http://www.xweza.com/Peshgotina%20devoke%20Hekariya.htm>

(serîlêdan, 05.02.2018)

Muhammed H. (2016) Daçek Di Zimanê Kurdî De

<https://zimannas.files.wordpress.com/2016/04/kanizar-dacek.pdf>

(serîlêdan, 02.05.2018)

Reşîd M. (2008). Mijara Daçekê (I)

http://www.kurdistanabinxete.com/Rojnamen_iro/Rojnamen_Taybet/Kurdax/Kurdax-Rojname-3.pdf

(serîlêdan, 02.05.2018)

Daçek di Zaravayê Kurmancî da

ORIJINALLIK RAPORU

% **13**

BENZERLIK ENDEKSI

% **13**

İNTERNET
KAYNAKLARI

% **1**

YAYINLAR

% **1**

ÖĞRENCİ ÖDEVLERİ

BİRİNCİL KAYNAKLAR

1

www.amidakurd.net

İnternet Kaynağı

% **5**

2

zimannas.files.wordpress.com

İnternet Kaynağı

% **1**

3

dengemamoste.com

İnternet Kaynağı

% **1**

4

papatyakutuphanesi.files.wordpress.com

İnternet Kaynağı

% **1**

5

www.xweza.com

İnternet Kaynağı

% **1**

6

ku.wikipedia.org

İnternet Kaynağı

% **1**

7

bnk.institutkurde.org

İnternet Kaynağı

% **1**

8

www.avestakurd.org

İnternet Kaynağı

<% **1**

9

rss2.com

İnternet Kaynağı

<% **1**

10	www.nefel.com İnternet Kaynağı	<%1
11	issuu.com İnternet Kaynağı	<%1
12	www.tirej.name İnternet Kaynağı	<%1
13	www.artuklu.edu.tr İnternet Kaynağı	<%1
14	www.nefel.nu İnternet Kaynağı	<%1
15	www.kurdlib.org İnternet Kaynağı	<%1
16	www.amidakurd.com İnternet Kaynağı	<%1
17	tr.wikipedia.org İnternet Kaynağı	<%1
18	www.tirsik.net İnternet Kaynağı	<%1
19	www.serhed.org İnternet Kaynağı	<%1
20	eski.artuklu.edu.tr İnternet Kaynağı	<%1
21	www.yek-dem.com	



İnternet Kaynağı

<%1

22

www.rojava.net

İnternet Kaynağı

<%1

23

www.ufkumuz.net

İnternet Kaynağı

<%1

24

ezidipress.com

İnternet Kaynağı

<%1

25

lup.lub.lu.se

İnternet Kaynağı

<%1

26

www.turkishstudies.net

İnternet Kaynağı

<%1

27

Submitted to CSU, Fullerton

Öğrenci Ödevi

<%1

28

muradciwan.com

İnternet Kaynağı

<%1

29

kurdistantribune.com

İnternet Kaynağı

<%1

30

www.pdk-xoybun.com

İnternet Kaynağı

<%1

31

"Festschrift für Klaus J. Hopt zum 70.
Geburtstag am 24. August 2010", Walter de
Gruyter GmbH, 2010

Yayın

<%1

32	KARACAN, Hasan and KHALİD, Hewa Salam. "Adjectives in Kurdish language: Comparison between dialects", Dicle Üniversitesi, 2016. Yayın	<%1
33	archive.org İnternet Kaynağı	<%1
34	www.enstituyakurdi.org İnternet Kaynağı	<%1
35	rbeb.org.br İnternet Kaynağı	<%1
36	iticam.net İnternet Kaynağı	<%1
37	Albrecht. Encyclopedia of Disability Yayın	<%1
38	www.neokuyorum.org İnternet Kaynağı	<%1
39	bilalrojava.tr.gg İnternet Kaynağı	<%1
40	www.cheric.org İnternet Kaynağı	<%1
41	Ahmet Akçay. "Examination of the Relationship between Demographic Characteristics of the Family and the Language Development of Children", International Journal of Higher Education, 2017	<%1



Mardin Artuklu Üniversitesi
Türkiye’de Yaşayan Diller Bölümü
Kürt Dili ve Kültürü Bölümü
Yüksek Lisans Tezi

KURMANCİ LEHÇESİNDE EDATLAR

BAHATTİN TAMAN
01252552

Danışman
Yard. Doç. Dr. MUSTAFA ASLAN

Mardin
2018